
ROJEVA Medya
3 Çile Sêşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 54



Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd bi xwe re êş û azarên mezin anîn. Gelê kurd, tevger, sazî û dezgehên kurdî dixwazin tecrîd were bidawîkirin

**Tecrîda li Îmraliyê her ku diçe tê kûrkirin û ev tecrîd siberojên gelan tarî dike. Bi tecrîdê re şer û pevçûn, êş û azarên nedîtî pêk hatin. Gelê kurd dixwaze rojek ji rojekê zûtir tecrîd bi dawî bibe. Gerîlayan jî da zanîn ku ew ê di sala 2017'an de bi têkoşîna xwe pergala Îmraliyê hilweşînin.**

### BI MEHAN E LI BENDA CENAZEYÊN ZAROKÊN XWE NE

# Vê hawarê bibihîzin

**Dewleta tirk di zilmê de tu sînoran nas nake. Ev serê 5 mehan e ku 58 cenazeyên ciwanên kurd ên li goristana bêkesan hatine veşartin nadin malbatên wan. Malbatan xwest civak vê zilmê qebûl neke**



#### QET NEBE ÊŞA ME FÊM BIKIN

Li Nisêbîna Mêrdînê ya 5 meh in qedexeya derketina kolanan bi dawî bûye li gel ku mînaka xwînê ji malbatan hatiye girtin jî hêj 58 cenaze teslîmî malbatan nehatine kirin. Malbatan ji raya giştî xwest ku ji êşa wan fêm bikin û ji bo bikarin cenazeyan wergirin bi hestyarî tev bigerin.

#### 9 AŞMÎ YO KE PAWEYÊ CENAZE YA

Dayîka Abdullah Ako ke wextê qedexeya Nısêbînî de hetê hêzê dewlete ra amebî kiştiş, Ayten Ake va 'lajê mi rayîrêko birûmet de têkoşîn da' wina domnaye: "9 aşmî yo ke ez cenazeya lajê xo gêrena. Lajê mi seba herra xo şer kerd. Cok ra ganî laşê ci bireso herra xo." ... R3/11

## Kalê 80 salî girtî lê tecawizkar serbest in

**Pîremêrê bi navê Îsa Sezek ê 80 salî beriya 24 rojan ji aliyê polîsên AKP'ê ve li Sêrtê bi îşkenceyê hat binçavkirin. Polîs û daraza tirk ên ku kalê Îsa ev 4 roj in di bin çavan de digirin li dijî tacîzkar û tecawizkaran pir bi rehm tev digerin. Murat A. yê ku tecawizî zarokekê kiribû, piştî ku sal û nîvekê di girtîgehê de ma ji aliyê dadgehê ve hat tahliyekirin...** RÛPEL - 3

## 2009 ra heta 2017 eynî çîyî qewimîyenî

**2009 de doza KCKyî ya bajarê Riha ser îfadeyê cinîyêk amebî amadekerdiş û bi seyan kesî bi serran hepisxaneyan de mendbî.**

**Bedlîs de zî cinîyêk hetê polîsan ra sey ajan ameye xebetnayîş. Hemşaredarê Bedlîsî zî tede bi seyan kesî îfadeyê na cinîye ser ra hîna zî tewqîfkerde yî...** RÛPEL - 11

## Girtin û binçavkirin

**Operasyonên qirkirina siyasî ya li dijî gelê kurd didomin...** RÛPEL - 3/6

## Li Colemêrg û Çinarê çalakiyên gerîlayan... R-3


## Bi Xezeba Firatê keleha zilmê hildiweşe R5

## Şemûn: Tirkiye hemû gelan hedef digire R5

## 'Werin em Pergala Îmraliyê birûxînin'




Endama Koordînasyona PAJK'ê Jiyan Lava diyar kir ku jin û ciwan bi çalakiyên xwe dikarin pergala Îmraliyê hilweşînin û azad bibin...R-7



## Gerîlayên YJA Starê: Aştî tê tecrîdkirin

Gerîlayan da zanîn ku aştî û demokrasiya gelan ji aliyê dewleta tirk ve bi tecrîda li Îmraliyê hatiye hepskirin û diyar kir ku ew ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd amade ne ku her tiştî bikin... RÛPEL - 7



## Gerîlayên HPG: Rêbertî xeta sor e

Gerîlayan anî ziman ku Rêberê Gelê Kurd ji bo wan xeta sor e û da zanîn ku nîqaşên der barê darvekirinê de hêrsa wan gelekî bilind kiriye... RÛPEL - 7

## DBP'a Amedê û rûspiyan yekitî nîqaş kir

Endam û rêveberên DBP'a Amedê bi rûspî û oldarên li Amedê re civiyan û têkildarî geşadanên li herêmê, yekitiya kurdan û girîngiya xurtkirina birêxistinbûna kurdan de nîqaş kirin... R-7



## 'Divê şerê navxweyî xeta sor a yekitiyê be'

Endamê Rêveberiya Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê Osman Karwanî diyar kir ku daxuyaniyên Nêçîrvan Barzanî xizmeta yekitiyê nakin û got ku divê birakujî xeta sor a yekitiyê be... R-7




## Êrîşa li dijî Reinayê DAIŞ'ê girt ser xwe

- Ajansa nûçeyan a îngilîz Reutersê têkildarî êrîşa li Reînaya Stenbolê ku şeva sersalê pêk hat, nûçeyek weşand û da zanîn ku DAIŞ'ê êrîş girtiye ser xwe.
- Welatiyê bi navê Yusuf Kodat ê ku şeva sersalê bû şahidê êrîşa li Reinayê da zanîn ku polîsên tirk 20 deqe piştî bûyerê hatine Reinayê...R-3



## Bexda kirin gola xwînê

Di serdana serokomarê Fransayê François Hollande ya Iraqê de li Bexdayê êrîşeke xwekujî pêk hat. Di encama êrîşa ku li taxa Sadr li dijî welatiyên şiî pêk hat de 32 kesan jiyana xwe ji dest da û 35 kes jî birîndar bûn...

RÛPEL - 4

www.arsivakurdi.org

## Li wargehê 68 xwendekar jehrî bûn

**LI SÊWAZÊ** li wargeheke taybet 68 xwendekarên jin bi gumana ku ji gaza xwezayî jehrî bûne rakirin nexweşxaneyê. Bûyera li taxa Halîl Rifat Paşa li wargeheke taybet a hîndekariya bilind rûda. Xwendekarên ku li wargehê diman nîvê şevê mîdeya wan geriya û dest bi vereşandinê kir. Piştî ku gelek xwendekar bi vê şikayetê ji xwê şiyar bûn ekîba tenduristiyê hat cihê bûyerê û bi gumana ku ji gaza xwezayî jahrî bûne xwendekar rakirin nexweşxaneyê. Di lêkolîna ku li ser xwendekaran hat kirin de hat aşkerakirin ku xwendekar ji gaza xwezayî jehrî bûne. Her wiha der barê bûyerê de lêpirsîn hat destpêkirin. SÊWAS - ŞÛJIN



## ‘Sêvê Demîr’ li dijî zilmê navê BERXWEDANÊ YE



Polîtîkayên zilm û çewisandinê yên dewletê ku li ser gelê kurd dide meşandin wekî her zarokek kurd di temênê xwe yê biçûk de bandor li ser Sêvê Demîr jî kir. Sêvê Demîr a ku di sala 1974’an de li Stewrêya Mêrdînê hat dinê û di 4 saliya xwe de li gel malbata xwe mecbûr ma koçî Manîsayê bike. Kevneşopiya têkoşîna Sêvê Demîr ji têkoşîna wê ya li metrepolan a ji bo parastina zimanê wê yê dayikê tê. Sêvê li gel ku li metrepolan jiya jî tu hêzan ew ji têkoşînê dûr nexist. Zilm û zordestiya li ser gelê kurd dihat meşandin ji cîranên xwe yên ku wekî malbata wê koç kiribûn guhadar dikir. Sêvê ya ku zilma li ser kurdan dihat meşandin qebûl nekir di temenê xwe yê biçûk de tev li têkoşînê bû.

Sêvê ya ku li Manîsayê di sala 2004’an de wekî rêvebera DEHAP’ê ya baSkê jinan dest bi xebatê kir, piştî wê li nav Tevgera Azad ya Jinan (DOKH) û li Komîsyona Jinan a KCD’ê bi awayekî aktîf têkoşîna xwe berdewam kir. Sêvê di sala 2009’an de di encama operasyonên qirkirina siyasî yên li ser KCD’ê de hat girtin û 5 salan di girtîgehê de ma.

Sêvê piştî ku serbest hat berdan ji derdora xwe re gotiye ku aramanca wê ya yekem ew e ku li têkoşîna xwe vegere. Piştre berê xwe dide cihê berxwedanê Silopiya Şirnexê. Sêvê ya ku xatir ji dayika xwe ya ku hatibû wê bibîne re wiha dibêje: “Em li vê derê ji bo gel û welatê xwe têkoşînê didin. Ger ku ez bimirim divê xwîna min li ser vê xakê biherike û mirina min bi şanazî be.”

Sêvê li Silopiyê di serdema berxwedanê de li dijî zilma dewletê gelê Silopiyê tenê nehişt, di 4’ê çileyê de bi jinên kurd ên siyastmedar Pakîze Nayir û Fatma Uyar re bi destê tîmên taybet ên dewletê hatin qetilkirin. AMED - ŞÛJIN

# ‘Em ê bi ruhê Sarayê tê bikoşin’

**Endama PAJK’ê Ronahî Serhat sala 2016’an ji aliyê jinan ve nirxand û anî ziman ku sala 2016’an ji bo jinan bûye sala têkoşîn û berxwedanê. Serhat got ku ew ê bi rûhê Sarayê li dijî faşizmê tê bikoşin**

ROSA ÎKARÛS / BEHDÎNAN - ANF

Endama Koordînasyona Partiya Azadiya Jinên Kurdistanê (PAJK) Ronahî Serhat sala 2016’an ji aliyê jinan ve nirxand û bang li jinan kir ku eniyeke enternasyonal ava bikin û li dijî şîdeta serweriya mêran xwe bi rêxistin bikin.

Ronahî Serhat destnîşan kir ka sala 2016’an ji bo jinan bûye sala têkoşîn û berxwedaneke mezin û wiha got: “Careke din aşkera bû ku rizgarkirina jinan û gelên me, avabûna sîstemeke azad û demokratîk bi têkoşînê dibe. Dema ku pêngavên şoreşgerî li ser bingeha birêxistinbûn, nêrîn û hişmendiya sosyalîst zêde bûn, hêzên dij bi şoreşger jî bi mekanîzmaya netewe dewlet ew çendî êriş kirin. Ev êriş bi rengekî birêkûpêk hatin kirin.”

Serhat da xuyakirin ku civakek bê jin nabe û destnîşan kir ku jin avaker û afirînerên nirxên civakî ne û ev tişt anî ziman: “Dîroka mirovahiyê bi jinan dest pê dike. Ev şêweyê êrîşê li dijî hemû nirxên dîrokî tê kirin. Jin bê qîmet tê hiştin û tê tunekirin. Modernîteya kapîtalîst, di şexsê jinan de civakê heps dike. Hewl tê dayîn ku modeleke jinan a girtî, serî tewandî, bêçare û koleya mêr bê afirandin. Modela AKP’ê jî li ser vê bingehê ava bûye. Lewma AKP êrîşeke îdeolojîk li jinan dike. Di nav netewe-dewletên din de jî rewş bi vî rengî ye. Li Afganistan, Misrê



û li hemû welatên ereb û dewletên Ewropayê jî heman rewş heye. Ji ber vê yekê tu nirxekî jinê nema ku mêr di nav vê salê de destê xwe dirêjî nekir. Hemû bernameyên medyayê li ser zayendî ye. Hewl didin ji aliyê exlaqî ve civakê hilweşînin.”

Serhat bal kişand ser hebûna hin organîzasyon û kombûnên jinan li gelemperiya cîhanê û wiha pê de çû: “Bêguman ev têrê nakin. Ji ber vê yekê divê em sala 2017’an bikin sala komûna enternasyonal a jinên cîhanê li dijî faşîzmê. Di şerê parvekirinê yê Rojhilata Navîn de girîng e jin bi vîneke xurtir derkevin holê û bibin xwedî mafê gotinê. Em bawerin jin dê vê gotinê bi xurtî bêjin. Bêguman ev yek têkoşîn e. Lewma hûn nikarin xwedawendan bêdeng bikin. Hûn nikarin milîtanên azadiyê bêdeng bikin. Hûn nikarin yên êşa Dayika Taybet ji bîr nekirine bê deng bikin. Hûn nikarin êşa Roboskê bê deng bikin. Em jin dizanin bê çima berdêleke bi vî rengî didin. Ji ber vê yekê em bi biryar in êşa xwe veguherînin hêzê. Faşîzm dê tu carî nikaribe vîna jinên azad teslîm bigire. Em ê bi ruhê hevrêya xwe Sarayê sala 2017’an pêşwazî bikin.”

### ‘Birêxistinbûna xwe XURT BIKIN’

**SERHAT** anî ziman ku sedsala 21’an dikare bibe serdemeke azadiya jinan û wiha dewam kir: “Haya jinan jê heye bê ka êrîşeke çawa lê tê kirin. Ya ku li dijî vê bê kirin, birêxistinbûna jinan e. Birêxistinbûn tê wateya berxwedanê. Li her qada jiyanê lazim e jin birêxistinbûna xwe xurt bikin. Bi rêya vê yekê dê şîdet û paşverûtiya mêran bê qelskirin. Ji ber vê yekê pêwîstiya jinan bi hevgirtin û mezinkirina têkoşînê heye.”

### Banga berxwedanê li jinan hat kirin

Serhat li dijî faşîzmê banga berxwedanê li jinan kir û destnîşan kir ku dem hatiye jin jiyana xwe bi rê ve bibin û wiha pê de çû: “Bi gelemperî li cîhanê hin hewldanên bi vî rengî hene. Ji Latîn Amerîka heta welatên din ev yek rû dide. Ji ber vê yekê, li dijî faşîzmê divê eniyeke nû ya berxwedanê li qada navneteweyî û herêmî were birêxistinkirin. Plansaziyeke me ya di vî warî de heye. Wekî jinên kurd mijareke din a ku divê em bi giranî li ser biaxivin, yekitiya neteweyî ye. Nîqaşa li ser sedemên yekîtî û hevgirtinê êdî ne pêwîst e. Jin hemû di dilê xwe de vê hîs dikin. Em bi aqil û hesta jinê piştast in. Ji ber vê yekê gelek kar hene divê em bikin. Me serî li ber paşverûtiya mêr netewand, em ê tu carî netewînin. Em ê bi sekna hevrê Sara li dijî faşîzmê, terora dewletê û şîdeta mêr tê bikoşin.”

# Tevgera jinan jiyana wê guhert

Z. NÊRGIZ BOTAN - ZENDA DÎROK / BEHDÎNAN - ANF

Gerîlaya YJA Starê Ronahî Viyan a li başûrê Kurdistanê ji dayik bû û di 2009’an de tev li nav refên gerîla bûye, berî û piştî gerîlabûna xwe nirxand.

Viyan da zanîn civaka başûrê Kurdistanê ku xwedî rewşeke feodal û mûxafazakar e, ji rastî û çanda xwe gelekî dûr e û wiha got: “Di nav vê civakê de rewşa jinê gelekî neyînî ye. Analîza ‘çûka di qefesê de’ ya Rêbertî têkildarî jinê kir, yekser li rastiya jinê ya li nav civaka ez lê dijiyam tê. Li Başûrê jin li malê hatine hepskirin. Di nav civakê de jiyan lê hatiye tengkirin û li paş hatiye hiştin.”

Viyan da xuyakirin ku ew beriya tevli nav refên gerîla bibe her tim di nav lêgerînên cuda de bûye û wiha domand: “Min nakokiyên li nav jiyanê lêpirsîn dikir. Lê kesek li dora min tunebû ku rê nîşanî min bide. Min her tim rêya rizgariyê digeriyam.”

Piştre Viyan li ser jiyana xwe ya piştî tevlibûna li nav têkoşîna azadiyê axivî û wiha dewam kir: “Piştî ku min gerîla bihîst, min dest bi lêkolînê kir. Bi taybetî hevalên jin ên tevlî nav refên azadiyê bûn, bala min dikişand. Min ji xwe re digot, bi hezaran jin belasebep derneketine serê çiyê. Bêguman sedemeke xwe heye. Ev rastî di nav navê PAJK’ê de veşartî bû. Ev tevger ji bo azadiya jinê têdikoşiya. Ev yek ji lêgerîna min ê destpêkê re bû bersiv. Tevî ku min hêj baş



PKK û PAJK’ê nas nedikir jî ev yek bû sedem ku tevli nav refên berxwedana azadiyê ya jinê bibim. Piştî tevli bûm, min dît ku hêdî hêdî ruhê min azad dibe. Tim jinên leheng ên berxwedêr diket bîra min. Wê demê min famkir ku biryareke çiqas rast daye.”

Viyan da xuyakirin ku heke îro li başûrê Kurdistanê qala hişmendiyeke neteweyî tê kirin, ev yek bi saya têkoşîna PKK’ê ye û ev tişt anî ziman: “PKK li Kurdistanê temsîliyeta hemû gelan dike. Bi dîtina min divê civak bi taybetî jî jin ji bo naskirina PKK’ê hêj bêhtir bikevin nav hewldanan. Heke rastî û têkoşîna PKK’ê bê famkirin dê nêrîna giştî biguhere. Lewma divê gelê me rastiyan bibîne û li gorî wê tebikoşe. Mifteya azadiyê ya gelê me yê li Başûr têkoşîna PKK’ê ye.”

Viyan herî dawî bang li jinên ciwan ên li başûrê Kurdistanê kir ku PKK’ê bixwînin, nas bikin, fêhm bikin û tev li nav tevgera jinan bibin.

# Divê kujer bên darizandin

Hevseroka Meclisa TEV-DEM’ê ya Kantona Kobanê Ayşe Efendî têkildarî doza şehîdxistina sê siyasetmedarên kurd Sakîne Cansiz, Leyla Şaylemez û Fîdan Dogan ku di 9’ê çileya 2013’an de li paytexta Fransayê Parîsê ji aliyê endamê MÎT’ê Omer Guney ku çend heft berê li girtîgehê bi awayekî guman mir, axivî û anî ziman ku şehadeta her sê siyasetmedarên kurd di encama kompoloya hikumeta tirk û fransayê de pêk hatiye û diyar kir ku divê îro li dijî vê kompoloyê têkoşîna xwe bidomînin û tola şehîdan hilînin.



Ayşe Efendî da zanîn ku dema navê Sakîne tê gotin mirov jina kurd a berxwedêr xeyal dike û ev tişt anî ziman: “Pêwîst e jina kurd têkoşîna xwe li ser rêya Sakîne dewam bike û erka xwe li hemberî şehîdên ku di oxira azadiya welat de jiyana xwe ji dest dane bi cih bînin. Divê kujerên hersê siyasetmedarên kurd bêne naskirin û darizandin.”

Her wiha Eyşe Efendî bang li hemû jinên her çar perçeyê Kurdistanê kir ku ji bo rizgarkirina jinê dest bidin hev. *KOBANÊ - ANHA*

# Bi tayên rengîn secadeyan çêdike

Aysun Kaya ya ku li taxa Cûdî ya Êlihê dijî 15 sal in bi tayên rengîn secadeyan çêdike. Kaya bi çêkirina secadeyan hem debara xwe dike hem jî çanda ku ji bavê xwe fêr bûye berdewam dike. Kaya ji bilî çêkirina secadeyan tabloyan jî çêdike.

Kaya destnîşan kir ku ew bi çêkirina secadeyan kêyfxweş e û der barê çêkirina wan de ev agahî dan: “Em tayên ku ji Dîlokê dikirin dibin makîneya ku dike tayên secadeyan. Piştî ku em diken tayê secadeyê bi navê ‘sermiye’ tînin atolyeya xwe. Ji her sermiyeyê nêzî 300 secade derdikeve. Piştre tayên rengîn ên ku em dibêjin ‘mahsur’ çêdikin û ji hundirê lulikê derbas dikin. Dema ev kar jî diqede em makîneya ku secade çêdike vedikin. Ji bo secadeyekî 4 xêzên ku rengan cuda dike



çêdikin. Piştre jî qasî ku em secadeyê jê bikin valahiyekî dihêlin û derbasî çêkirina secadeyekî din bidin.”

Kaya destnîşan kir ku secadeyên ku ew çêdikin rastî eleqeyên mezin tên û wiha got: “Em secadeyên ku çêdikin diforişin toptanfiroşan. Gelek caran jî jin tên ji bo cihêzên zarokên xwe dikirin.”

Kaya da zanîn ku ew ji tayên qazaxên kevn jî secade çêdikin û wiha domand: “Jinên taxê tayên ku bi kar naynin û qazaxên xwe yên kevn kom dikin ji me re tînin û em jî ji wan secadeyan çêdikin.” ÊLIH - DÎHABER

www.arsivakurd.org

## Li dijî Emniyeta Çinarê çalakî

Li dijî Midûriyeta Emniyetê ya navçeya Çinarê ya Amedê çalakiyek hat lidarxistin. Piştî çalakiya bi roketan û çekên lûledirêj, li herêmê şer qewimî. Gelek ambûlans sewqî cihê bûyerê hatin kirin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê jî li ser çalakiya gerîla ya 1'ê Çileyê ku li Colemêrgê pêk hat, daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayîn: "Di 1'ê Çileyê de li dijî leşkerên li ser girê Elîşêr ê li herêma Oremarê ya li navçeya Gever a Colemêrgê, hêzên me bi hewanan çalakiyek li dar xist. Hejmara leşkerên di vê çalakiyê de mirin û birîndar bûn, aşkera bû. Di 2'yê Çileyê de Alaya Garê ya li navçeya Şemzînan a Colemêrgê obus û hewan avêtin girê Karker." AMED - ANF

# 5 meh in cenaze nayên dayîn

Li navçeya Nisêbînê 5 meh in qedexeya derketina kolanan bi dawî bûye, li gel ku mînaka xwînê ji malbatan hatiye girtin jî hêj 58 cenaze teslîmî malbatan nehatine kirin




Li navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê li gel 5 meh derbas bûn ku qedexeya derketina kolanan bi dawî bû jî hêj testa cenazeyên 58 kesan aşkera nebûye. Walîtiya Mêrdînê di 14'ê adara 2016'an de li navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê qedexeya derketina kolanan îlan kir. 9 meh berê qedexe hat îlankirin û ji wê demê heta niha bi dehan kesan li taxên Nisêbênê jiyana xwe ji dest da. Di 25'ê tîrmehê de qedexeya derketina kolanan bi awayekî qismî bi dawî bû. Li gel 5 meh di ser qedexeyan re derbas bûn jî hêj nasnameya cenazeyan aşkera nebûye. Malbatên 83 kesan ji bo cenazeyên zarokên xwe tespît bikin serî li Saziya Tipa Edlî ya Mêrdînê da.

Piştî ku saziya Tipa Edlî ya Mêrdînê mînaka xwînê ji malbatan girt, cenazeyên 25 kesan hatin teşhîskirin û teslîmî malbatan kirin. Lê cenazeyê 58 kesan li gel ku malbatan mînaka xwînê daye jî nehatine teslîmkirin. Ji cenazeyên ku li benda tespîtkirinê ne, 23 cenaze li Riha, 21 cenaze li Mêrdîn, 6 cenaze li Amedê li goristanên bêkesan hatin definkirin. Hat zanîn ku cenazeyên 8 kesan jî li Saziya Tipa Edlî ya Stenbolê tên rawestandin. Her wiha heta niha malbatan 25 cenazeyên zarokên xwe wergirtine. *MÊRDÎN*

## Di dosyaya îstîsmara zayendî de biryara bêrayebûnê

Di dosyaya zaroka 11 salî de ku li Çinarê ji ber îstîsmara zayendî ducanî mabû û zarokek anîbû dinê ji ber ku gotibû bûyer li Sêwazê qewimiye biryara bêrayebûnê hat dayîn û dosya şandin Sêwazê. Di lêpirsîna ku ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Amedê hate destpêkirin de îfadeya kesên ji malbatê nehat girtin. Malbata ku serî li Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) da xwest bûyer bê ronîkirin û têkîldarî bûyerê heta niha kesek nehat binçavkirin.

Ji parêzerên ÎHD'ê ku bi dosyayê re eleqedar dibe Ercan Yilmaz diyar kir ku dosya bi biryara bêrayebûnê çûye Sêwazê lê ev biryareke rast nîne. Yilmaz da zanîn ku îfadeyên malbatê nehatine girtin, ew ê daxwaznameyekê bidin û bixwazin dosyayê careke din bînin Amedê. Ji parêzerên ÎHD'ê Hatîce Demîr jî da zanîn ku G. û zarok niha di bin parastina dewletê de ne, dibe ku zarok ji hin tiştan bitirse, di navbera gotinên zarok û malbata wê de nakokî hene û wiha got: "Zarok dibêje bûyer li Sêwazê qewimiye, ji ber vê yekê dosya şandin Sêwazê. Lêpirsîn kêm hatine kirin. Ji ber ku lêpirsîn kêm hatiye kirin em ê daxwaznameyekê bidin û bixwazin lêpirsîn bê berfirehkirin." *AMED - DÎHABER*




## Destê alîkariyê bidin Behiyeyê

Behiye Kaplan a ji ber qedexeya derketina kolanê ya li Şirnexê neçar ma koçî Wanê bike, ji ber ku sotemeniya wê qediyaye betaniyan li zarokên xwe dipêçe. Behiyeyê ji bo zarokên xwe yên nexweş di serî de bang li jinan û her kesî kir ku piştgiriyê bidin wê.

Keça wê ya 5 salî Yeşîm jî dilê wê qul e û ji ber ku derfetên wan tune ne, ji dema ku koç kirine heta niha neçûye nexweşxaneyê. Behiye di şevnişînekê de dijî û zarokên xwe li dora sobeyê kom dike. Camên paceyê tune ne û bi naylonan girtine. Kaplan diyar kir ku tu tiştekî wan tune ye û anî ziman ku ji vê zilmê re ne biyanî ne û di salên 90'î de jî bi zorê hatine koçberkirin û wiha got: "Ya mirov li ser piyan bigire ne xanî ye, jiyaneke birûmet e. Em hatin koçberkirin. Têkoşîneke me ya mezin heye. Em tu carî bi hêrs û kînê tev negeriyane. Wesayîtên zirxî û kesên rûpoş ketin axa me û xwîn li axa me rijiya. Zarokên me hatin qetilkirin. Axa me bi xwînê hatin avdan." *WAN - ŞÛJIN*




# Welatiyê 80 salî 24 roj in di bin çavan de ye

Li Sêrtê polîsan di 10'ê kanûna 2016'an de bi ser mala kalê 80 salî yê bi navê Hacî Îsa Sezek de girt û ew binçav kir. Sezek 24 roj in di bin çavan de ye. Li gorî agahiyên ku parêzeran dane hê jî îfadeya Sezek nehatiye girtin û polîs li bendê ne ku ji bo hemû kesên di lîsteyê de navên wan hene û piştre dê îfadeya wî bê girtin. Sezek ê par di meha adarê de jî hat binçavkirin û bi "kontrola edlî" hat berdan hefteyê careke diçû îmze diavêt. Beriya 10 mehan jî kurek û 2 neviyên wî hatin girtin. Neviyê Sezek ê 12 salî jî di 14'ê tîrmeha 2016'an de dema li banê malê radiza ji ber gulebarana hat kirin jiyana xwe ji dest dabû.

Bûka Sezek, Hatîce Sezek da zanîn ku polîsan bi ser mala wan de girtiye û wiha axivî: "Ji ber ku em sewalkariyê dikin serê sibehê zû radibin û diçin axurê. Di vê navberê de timên taybet ên rûpoş ketin hundirê malê û gotina 'çima deriyê we vekirî ye, gelo yek revî?' bi kar anî û qîr kirin. Me jî got em ê biçin axurê, li ser vê yekê heqaret li me kirin. Gazî xezûrê min kirin. Li ser betonê pêxas dan rawestandin. Dema ku me îtiraz kir, bi ser min û gorima min de hatin. Bavê min jî ber sermayê ricifî, li ser vê destûr dan em betanî biavêjin ser wî."

Sezek da zanîn ku tîmên taybet di lêgerînê de mal tevlihev kiriye û hemû tiştên 3 reng ên di sandoqan de derxistine û li hewşê şewitandine. *SÊRT - DÎHABER*



# Polîs piştî 20 deqeyan hatin

Di 1'ê Çileyê de ku li dijî navenda şahiyê a bi navê Reina ya Ortakoya Stenbolê êrîş pêk hat, DAIŞ'ê girt ser xwe. Di êrîşê de 39 kesan jiyana xwe ji dest da û 65 kes birîndar bûn. Ji 39 kesên jiyana xwe ji dest da, cenazeyê 15 kesan hat wergirtin. Saziya Tipa Edlî rapora yekem aşkera kir. Li gorî rapora otopsiyê kesên jiyana xwe ji dest daye, bi guleyan jiyana xwe ji dest daye. Hat diyarkirin ku gule aîdî çekên otomotîk in. Li gorî raporê hin gule ji bedenekê derbasî bedeneke din bûne. Ji yekê zêdetir gule li cenazeyan ketine. Gelekan ji wan li cihê bûyerê jiyana xwe ji dest daye. Li gorî raporê gule ji nêzîk ve hatine avêtin. Hin kes ji sînga xwe ve hin kesan ji serê xwe ve û hin kes ji pişta xwe ve ji nêzîk ve bûye hedefa êrîşan. Ji ber ku hemû cenaze bi çavan tên naskirin pêdivî bi testa DNA'yê nehatiye dîtin.

Ji 65 kesên birîndar bûne rewşa 4 kesan giran e. Dermankirina wan li Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdeyê ya Etfalê û Nexweşxaneya Okmeydanî, Îstinye, û New Hospitalê didomin.

Yusuf Kodat ê ku got di êrîşa li dijî Reinayê de xwe di nava kursiyan de veşartiye û xilas bûye wiha axivî: "Polîs piştî ku 20 deqîqe derbas bûn, hatin. Kesên birîndar û yên xwîn jê diçû, gelek bûn." *STENBOL - DÎHABER*



## Ji ber ku laîktî xwest hat binçavkirin

**ENDAMA HALKEVLERIYÊ** Ayşegul Başar piştî êrîşa li dijî Reinayê ya li Ortakoy a Stenbolê bi komeke hevalên xwe re li qehwexaneyan digeriya û ji bo laîktiyê banga têkoşînê dikir, hat binçavkirin. Dîmenên ku ciwan li qahwexaneyan digerin û girîngiya laîkbûnê vedibêjin li ser Twitterê îxbarî xeta Wezareta Karên Hundir hatibû kirin û binçavkirina ciwanan hatibû xwestin. Endama Halkevleriyê Ayşegul Başar a ku di dîmenan de cih digire, hate zanîn ku duh serê sibehê hate binçavkirin. Têkîldarî mijarê parlamenterê CHP'ê Bariş Yarkadaş got ku ji bo Başar 5 roj dema binçavkirinê hatiye xwestin. STENBOL - DÎHABER

## Swêd dê giraniyê bide aştî û jinan



**WEZÎRA KARÊN DERVE YA SWÊDÊ** Margot Wallstrom der barê tevlîbûna Swêdê ya Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) de daxuyaniyek da û diyar kir ku di demeke ku li cîhanê gelek tevlihevî hene de wan cihê xwe di nav Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî de girtiye û ev tişt anî ziman: "Rewşa aloz a li nêzî me zêde bû. Hevkariya di navbera Yekitiya Ewropa û Neteweyên Yekbûyî de piştî şer ji bo pêkanîna aştiyê hat destpêkirin, bi gumanbarî tê dîtin. Li şûna vê yekê, dengekî bilind ê neteweperestiyê tê." Wallstrom da zanîn ku ew ê ji bo ku hewldanên aştiyê zêde bikin û jin hêj bêhtir cihê xwe di nav pêvajoyên aştiyê de bigirin, bixebitin. STOCKHOLM



# Guterres banga aştî û diyalogê kir

Antonîo Guterres ji ber şerê li cîhanê banga aştî û diyalogê li hikumetan kir û ji hikumetan xwest ku li şûna şer ji bo lihevkirinan li dora maseyên muzakereyê bên cem hev



Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Antonîo Guterres ku roja destpêka salê bi awayekî fermî dest bi peywirê kir, daxuyaniyek weşand û banga aştî û diyalogê li hikumetan kir. Guterres di daxuyaniya xwe de diyar kir ku hemû helwdanên wan ên mirovî yên wekî rûmet, hêvî, pêşketin û aramiyê bi aştiyê ve girêdayî ne û aştî jî bi mirovan ve girêdayî ye.

Guterres di daxuyaniya xwe de şerên li cîhanê bi bîr xistin û destnîşan kir ku alîkariya ji bo milyonan mirovên bûne mexdûrê şer, mijara wan a sereke ye û wiha pê de çû: "Di encama şeran de bi milyonan mirov mirin, birîndar bûn, hatin sirgûnkirin û xîzan bûn."

Guterres di berdewama daxuyaniya xwe de got ku ji bo tunekirina pergalên aboriyê û civakan bi trilyonan dolar tên xerckirin û ji welatî û hikumetên cîhanê xwest ku ji bo aştiyeke mayînde bikevin nav hewldanan. Guterres di dawiya daxuyaniya xwe de banga diyalogê li aliyên şer kir û ji aliyan xwest ku li şûna şer ji bo lihevkirinê li dora maseyên muzakereyê bên cem hev.

Guterres ê ku roja destpêka salê dest bi peywira xwe ya Sekreteriya Giştî ya NY'ê kir, îro dê li civata NY'ê biaxive. *NEW YORK*

## Tirkmenistanê gaza xwezayî ya Îranê birî



Qeyrana ji ber zêdebûna buhayê gaza xwezayî ya di navbera Tirkmenistan û Îranê de derket, berdewam dike. Şirketa Gazê ya Neteweyî ya Îranê (NIGC) li ser malpera xwe ya fermî ragihand ku Şîrketa Gaza Xwezayî ya Tirkmenistanê gaza ku dişand Îranê biriye. Rayadarên Tirkmenistanê jî Îranê bi nedayîna ferqa zêdebûna buhayê gazê sûcdar kirin û da zanîn ku ji ber vê yekê gaza dişînin Îranê biriye. TEHRAN

## Li dijî mizgeftê êrîşa bombeyî



Li bajarê Herata yê Afganistanê li hemberî mizgefteke şiiyan êrîşeke bombeyî pêk hat. Berdevkê Walîtiya Herata yê Ceylanî Farhad der barê êrîşê de daxuyaniyek da û diyar kir ku êrîş di saetên şevê dema nimêja îşayê de bi wesayîteke bombebarkirî pêk hatiye û 6 kes birîndar bûne. Ji ber ku tu rêxistinê êrîşê negirtiye ser xwe, tê gumankirin ku êrîş ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve pêk hatibe. KABÎL

## Bi firsenda aştiyê êrîşî ELN'ê dikin



Piştî ku li Kolombiyayê di navbera Hêzên Şoreşger ên Çekdar ên Kolombiyayê (FARC) û hikumeta Kolombiyayê de peymana aştiyê hat mohrkirin, hêzên ewlehiyê yên Kolombiyayê êrîşên xwe yên li dijî Artêşa Rizgariya Neteweyî (ELN) zêde kirin. Li gorî agahiyên ku ji çapemeniya Kolombiyayê hatin bidestxistin, di van êrîşan de 20 gerîlayên ELN'ê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve dîl hatine girtin. BAGOTA

## Li Bexdayê 32 mirî

Di serdana serokomarê Fransayê François Hollande a Iraqê de li paytext Bexdayê êrîşeke xwekujî pêk hat. Di encama êrîşa ku li taxa Sadr li dijî welatiyên şiî pêk hat de 32 kesan jiyana xwe ji dest da û 35 kes jî birîndar bûn. Roja şemiyê jî ji ber 3 êrîşên bombeyî yên li paytext Bexdayê 29 kes û li Necefê jî di êrîşeke li dijî bendeke kontrolê de 7 polîsan jiyana xwe ji dest da. BEXDA



## Têlên Ceûtayê penaber birîndar kirin

Zêdeyî hezar penaberên ku ji welatên Sahara Afrîkayê xwestin derbasî bajarê Ceûtayê yê Îspanyayê ku bi xaka Fasê dorpêçkiriye, birîndar bûn. Penaberên ku li dora Ceûtayê li hev civiyan û hewldan bi dûwarên ku bi têlan hatine girtin ve rapelikin û derbasî bajarê Ceûtayê bibin rastî mudaxaleya hêzên ewlehiyên yên Îspanya û Fasê hatin.

Hejmarek zêde penaberên ku hewl didan derbasî Ceûtayê bibin û hêzên ewlehiyê yên Îspanya û Fasê birîndar bûn. Walîtiya Ceûtayê der barê hewldana penaberan de daxuyaniyek da û diyar kir ku penaberan bi çoyên ji hesin û keviran êrîşî polîsan kirine û di encama êrîşê de 6 polîs birîndar bûne.

Her wiha walîtiyê ragihand ku 100 penaber ligel ku ji têlên yekemîn derbasbûne û jî nikaribûne dûwarê parastinê yê duyemîn derbas bikin. Bajarê Ceûta ku li bakurê Fasê ye bi têl û dûwaran girtî ye. Ceûta û Melîlla ji bo penaberên li Fasê derbasî nava axa Yekîtiya Ewropayê bibin weke enklavê tên bikaranîn. *CEÛTA*

## Qonax bû hêviya rizgarkirina rojhilatê Mûsilê

Qonaxa duyemîn a rizgarkirina operasyona Mûsilê ya ku beriya çend rojan hat destpêkirin bê navber berdewam dike. Berdevkê Ragihandin û Çapemeniya Hêzên Dijî Terorê yên Iraqê Sebah Nehman der barê qonaxê de daxuyanî da û ragihand ku rojhilatê Musilê ji aliyê balafirên artêşa Iraqê û koalîsyonê ve tê bombebarankirin.

Nehman da zanîn ku rizgarkirina rojhilatê Mûsilê ji bo rizgarkirina rojavayê Mûsilê girîng e û ji ber vê yekê divê rojhilatê Mûsilê di qonaxa duyemîn a operasyonê de bê rizgarkirin. Hat ragihandin ku desteya tîmên rakirina mayînan taxên Selam, Şeyma, Sumer ku beriya niha hatibûn rizgarkirin ji mayînan paqij dikin.

Li gorî agahiyên hatin bidestxistin, ji sedî 60'ê rojhilatê Mûsilê ji çeteyên DAIŞ'ê hatiye rizgarkirin. *MÛSIL*




## Hollande serdana xwe ya Iraqê pêk anî



Serokomarê Fransayê François Hollande ji bo ku leşkerên Fransayê yên di nav koalîsyonê de ziyaret bike bi Wezîrê Parastinê yê Fransayê Jean Yves Le Drîan re serdana Iraqê kir. Hollande bi vê serdana xwe bû lîderê yekemîn ku di 2 salên dawî de 2 car e serdana Iraqê dike. Serokomar Hollande li Bexdayê bi serokomarê Iraqê Fûad Mahsûm û serokwezîrê Iraqê Haydar Ebadî re hevdîtin kirin.

Piştî hevdîtinan Hollande daxuyaniyek da çapemeniyê û diyar kir ku di serdana wî ya yekemîn de gelek deverên Iraqê di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de bûne û wiha pê de çû: "Niha rewşa ewlekariya Iraqê baştir e û hêzên ewlekariye gelek herêman ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar bikin."

François Hollande piştgiriya xwe ya bi Iraqê re anî ziman û got ku ew ê piştgiriya xwe ya ji bo gelê Mûsilê berdewam bikin û piştî têkçûna çeteyên DAIŞ'ê di ji nû ve avakirina Iraqê de cih bigirin. Hollande piştî hevdîtinên xwe yên Bexdayê derbasî Hewlêrê bû. BEXDA



## Sala nû li zarokan pîroz kirin

Bi boneya sersala nû, endamên Navenda Çand û Hûnerê ya Aram Tîgran a Girkê Legê li kolanên Girkê Legê û Rimêlanê geriyan û şêranî li zarokan belav kir. Endamên navendê yên ku şêranî li zarokan belav dikirin, cil û bergên rengîn li xwe kiribûn û ji zarokan re stran digotin. Di heman demê de bi dehan zarokên Girkê Legê û Rimêlanê jî li derdora endaman bûn xelek û kêfxweşiya xwe nîşan da. GIRKÊ LEGÊ



## Sersal li malbatên şehîdan pîroz kirin

Şandeyek a ku ji endamên TEV-DEM, YPG, YPJ, PYD û Meclisa Til Koçerê pêk dihat, bi boneya sala nû malbatên şehîdan ên gundên Cedawî, Um El Kihêf, El Şahir, El Taş El Xerbî û El Coz El Sexîr ên Til Koçerê ziyaret kirin. Di serdanê de şandeyê sala nû li malbatên şehîdan pîroz kir. Şandeyê ji bo sala nû jî hêviya serkeftin û aştiyê kir. Malbatên şehîdan jî ji bo serdanê spasiyên xwe pêşkêşî şandeyê kir û soza şopandina rêya şehîdan da. GIRKÊ LEGÊ



## Sala nû li şervanan pîroz kirin

Şandeyek ku ji endamên Komîteya Têkiliyan a TEV-DEM'ê, nûnerên partiyên siyasî û rûspiyên êlên ereb pêk dihat, bi armanca pîrozkirina sala nû serdana baregehên hêzên Erka Xweparstinê yên li gundê Girzîrê kirin. Di hevdîtinê de Endamê Komîteya Gitştî ya Têkiliyan a TEV-DEM'ê Ebduselam Ehmed sala nû li hemû endaman pîroz kir û hêviya serkeftinê kir. Hevserokê Desteya Parastinê yê Kantona Cizîrê Rêzan Gulo jî spasiya şandeyê kir. Merasîm bi lidarxistina şahiyeke biçûk bi dawî bû. DÊRIK



## Parkên Minbicê têne paqijkirin

Di çarçoveya ji nû ve amadekirina parkên bajêr, Şaredariya Gel a Minbicê bi beşdariya 16 karkeran, dest bi hemleya paqijkirina parka giştî ya Minbicê kir. Şaredariya Gel piştî paqijkirina parka giştî ya bajêr dê daran jî tê de biçîne, ronahiyê lê zêde bike û lîstokên zarokan sererast bike. Der barê mijarê de endamê Rêveberiya Şaredariya Gel a Minbicê Sedam Bekar diyar kir ku hemleya wan a paqijkirin û sererastkirina parkên Minbicê didome û da zanîn ku pêdiviya wan bi xebatkaran heye. MINBIC

# Bi xebata xwe civaka xwe zana dike

CEFER CEFO / EFRÎN - ANHA

Apê Qaziqlî Reşîd ev sê sal in rojnameya Ronahî belav dike û armanca xwe ya ji vê yekê jî wiha tîne ziman: "Bi vê yekê ez dixwazim fikrên neteweya demokratîk û azadiyê di nava gel de belav bikim."

Qaziqlî Reşîd (60) ji niştecihên navçeya Şiyê ya Kantona Efrînê ye û bavê 4 keç û 2 kuran e. Malbata Apê Reşîd ji destpêka têkoşîna Tevgera Azadiya Kurd heta niha di nava têkoşînê de cih digire. Apê Reşîd tevî temenê xwe yê mezin, her rojên yekşem û çarşemê rojnameya Ronahî li xwînerên wê belav dike.

Tevî ku navçeya Şiyeyê cihekî çiyayî û hatin û çûn lê zehmete jî, apê Reşîd saet 08.00'an ji mala xwe derdikeve û bê teredud rojnameyê di nav gel de heta danê êvarê belav dike. Apê Qaziqlî Reşîd armanca xwe ya ji belavkirina rojnameyê wiha tîne



ziman: "Ez bi vî karê xwe di nava civakê de zanebûn, fikra azadiyê û neteweya demokratîk belav dikim. Her wiha bûyerên ku diqewimin bi şêniyên herêma xwe re parve dikim."

Apê Reşîd tevî ku rewşa wî ya aborî ne baş e jî dest ji karê xwe bernade. Herî dawî jî Apê Reşît ev tişt anî ziman: "Em dijîn û tu kes ji birçîbûnê namire. Em niha di dema şoreşê de ne û xizmeta ji bo welat, erka her kesî ye. Ez temenê xwe ji bo vê xebata xwe mezin nabînim."

# Keleha zilmê diheje

**Şervanê HSD'ê Mûsab El Hîsam diyar kir ku ew gav bi gav bejahiya Reqqayê ji çeteyan rizgar dikin û da zanîn ku bi hejandina keleha zilmê tola hemû gelan ji çeteyan hiltînin**

MAHÎR YILMAZKAYA / REQQA - ANF

Şervanê bi navê Mûsab El Hîsam ku bi qasî 4 meh û nîvan di destê çeteyên DAIŞ'ê de dîl bû, tev li refên HSD'ê bû. El Hisam ê ku di Xezeba Firatê de cih digire wiha got: "Ez niha hesab ji zaliman dipirsim."

Mûsab El Hîsam (29) ji Reqqayê ye û bavê 2 zarokan e. Di 12 saliya xwe de ji ber ku rewşa malbatê di warê aborî de ne baş bû, koçî Girê Spî dikin. Piştî demekê rewşa wan careke din baş dibe û malbat vedigere Reqqayê. Di sala 2011'an de tevli nava serhildana gel a li Sûriyeyê bû. Piştî serhildan veguherî şerê navxweyî jî bi gotina wî; 'xwe bê deng kir.' Bi destpêkirina şerê navxweyî, Reqqa kete bin dagirkeriya çeteyên Artêşa Azad, El Nusra û Ehrar El Şamê.

### ÎŞKENCEYÊ DIBÎNE

El Hîsam da zanîn ku bi firehbûna dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê li Reqqayê, xwest ji bajêr derkeve. Lê ji hêla çeteyên DAIŞ'ê tê girtin û diavêjin zindanê. El Hîsam 4 meh û nîvan di destê çeteyan de rastî îşkenceyeke giran tê. El Hîsam ji destê çeteyan direve û xwe digihîne Girê Spî ku di hezîrana 2015'an de hatibû rizgarkirin. Herî dawî jî biryara tevlîbûna refên HSD'e dide.

### PÊŞVEÇÛNÊN MEZIN

Şervan Mûsa El Hîsam niha di pêngava Xezeba Firatê de cih digire û li dijî çeteyên DAIŞ'ê şer dike. El Hîsam got ku çeteyên DAIŞ'ê dixwazin dagirkeriya xwe mîsoger bikin û wiha domand: "Li gund, gundik û girên stratejîk şerekî dijwar qewimî. Me piraniya wan paqij kirin. Em gav bi gav ber bi keleha zilmê ve diçin. Keleha zilmê diheje. Bi rizgarkirina Reqqayê em ê hesabê hemû gelên Sûriyeyê ji çeteyan bipirsin. Em ê tola jinên li bazara Reqqayê hatin firotin, hilînin."



## Du gundên din hatin rizgarkirin

Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê di encama pevçûnên dijwar de, gundên Şalî û Henhud ên li başûrê rojavayê Eyn Îsayê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin.

Hemleya Xezeba Firatê ya ku şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê bi armanca rizgarkirina Reqqayê daye destpêkirin, didome. Di çarçoveya qonaxa duyemîn a hemleyê de ku şervanan di 1'ê kanûnê de baskeke din jî ji bajaroka Til Semin a Eyn Îsayê dabû destpêkirin, gundên Şalî û Henhûdê hatin rizgarkirin.

Hat zanîn ku di encama pêvçûnên li van gundan de bi qasî hatiye zelalkirin 3 çete hatin kuştin û çek û cebilxaneya wan jî hatin desteserkirin.

REQQA - ANHA

## Ji bo rizgariyê di têkoşînê de bi israr in

Fermandarê Tugaya Şems El Şemal Ebû Adil da zanîn ku hêzên wan bi awayekî aktîf beşdarî qonaxa duyemîn a hemleya Xezeba Firatê bûne.

Di qonaxa duyemîn a pêngava Xezeba Firatê de gelek hêz tevli bûn. Yek ji van hêzan jî Tugaya Şems El Şemal e. Der barê mijarê fermandarê Tugayê Mihemed Ebû Adil destnîşan kir ku şervanên wan tevli çeperên berxwedanê bûne û ji bo rizgarkirina gundên Reqqayê ji çeteyên DAIŞ'ê jîbi israrin.

Fermandar Ebû Adil da zanîn ku 150 şervanên tugaya wan tevli şerê rizgarkirina gundên Bendava Tişrînê, gundê Sêgul û gundewarên rojavayê Reqqayê bûne û wiha bi dawî kir: "Em weke hêzeke sereke beşdarî hemleya rizgarkirina gundewarên rojavayê Reqqayê bûn. Em amade ne ku tevahiya axa Sûriyeyê ji komên çete yên DAIŞ'ê rizgar bikin." REQQA



# 'Hemû gelan hedef digirin'

CÎHAD ROJ / QAMIŞLO - ANHA

Endamê Rêveberiya Partiya Yekitiya Suryanî Gabriyel Şemûn da zanîn ku armanca Tirkiyeyê derbekirina federaliya demokratîk e.

Gabrîel Şemûn diyar kir ku Tirkiye dixwaze bi dagirkirina bakurê Sûriyeyê projeya federaliya demokratîk a ku mafên hemû pêkhateyên herêmê diparêze, têk bibe. Şemûn da zanîn ku federaliya demokratîk dê dîktatoriyên neteweyî hilweşîne û ji ber vê yekê jî Tirkiye ditirse.



### BÊDENGIYA CÎHANÊ

Şemûn got ku tevî ku Tirkiye li herêmê komkujiyan pêk tîne jî, dewletên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe bê deng in û wiha dom kir: "Em ê bi ked û xebatên xwe vê bêdengiyê bişikînin. Federaliya demokratîk li ser lihevkirina hemû pêkhateyan pêk hat. Bi hedefgirtina vê projeyê jî, hemû gelan hedef digirin."

### MUXALEFET TÊK ÇÛ

Di dawiyê de jî Şemûn wiha got: "Tirkiye hêzên muxalefetê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne. Muxalefet nikare derveyî fermanên Tirkiyeyê tev bigere. Muxalefet, têk çû. Tirkiye ji bo Babê Heleb firot û dê Idlibê jî bifiroşe. Têkiliyên Tirkiye û Rûsyayê li ser bingeha têkiliyên stratejîk û berjewendiyên demkî bi pêş ketin. Her du alî jî dixwazin têkiliyên aborî xurt bikin."

## TEV-DEM'ê spasname dan hêzên parastinê

Hevserokatiya TEV-DEM'ê bi boneya amadekarî û xebatên hêzên parastinê yên ji bo sala nû, ji hemû hêzên parastinê re spasname şandin. Di spasnameyê de hat gotin ku ewlehiya mirovan stûneke bingehîn e û pêkanîna ewlehiyê xebateke pîroz e.Di spasnameyê de ev tişt hat parvekirin: "Em, bi çavekî mezin li xebata hemû hêzên parastinê dinêrin. Bi saya xebat, şiyarî û berevaniya we axa Rojava bûye mînaka warên ewle li Sûriyeyê. Bi vê boneyê em we pîroz dikin û spasiyên xwe pêşkêş dikin." QAMIŞLO

## Mamoste amadekariya ezmûnan dikin

Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC-Demokraîtk) dest bi amadekariya ezmûnên xwendekaran kir. Di çarçoveya xebatan de niha amadekariyên ezmûnên xwendekarên seretayî tê kirin. Xebatên amadekariya ezmûnan li bajarê Amûdê dest pê kirin. Pelên ezmûnan ên bi zimanê kurdî, erebî ji polên yekê û heta 6'an hatin amadekirin. Bi armanca amadekirina pirsên di ezmûnê de, hemû mamoste li Yekitiya Mamosteyan a Amûdê kom bûn û dest bi xebatên xwe kir. Di demên pêş de dê ezmûn werin destpêkirin. AMÛDÊ

www.arsivakurdi.org

# Deynê sektora taybet zêde bû

**Li Tirkiyeyê ji ber polîtîkayên dewleta AKP'ê her ku diçe krîza aborî mezin dibe. Pereyê Tirkiyeyê li hemberî pereyên welatîn din bê qîmet dibe. Gelek esnaf li ber îflasê ne û deynê sektora taybet li gorî daneyan zêde bû**



Deynê Sektora Taybet ê derve ji 224 milyar dolarî derbas bû. Hat zanîn ku sektora taybet ji welatên Ewropayê 130 milyar dolar deyn kiriye.

Li gorî daneyên Bankaya Navendî (MB), deynê sektora taybet ê Ewropa zêde bûye. Ji meha cotmeha 2016'an û şûnde deynê sektora taybet gihaşt 224 milyar dolarî. 207 milyar dolar deynê demdirêj û 17 milyar dolar jî deynê demkurt e. Sektora taybet herî zêde bi 29,27 milyar dolar ji welatên Îngilistan, Galler, Îskoçya û Îrlanda deyndarê dema dirêj e. Bi 20.3 milyar dolar jî ji DYA re deyndar e. Bi 20,01 milyar dolar jî ji Almanya re deyndar e. Sektorên taybet ên Tirkiye bi 16,7 milyar dolaran ji Holandayê re, bi 12,05 milyar dolaran ji Luksemburgê re, bi 11,44 ji Bahreynê re, bi 9,33 milyar dolaran ji Avusturya re, bi 7,37 milyar dolaran ji Fransa û bi 5,39 milyar dolaran Belçîkayê re deyndar e. Ji bo dema kurt jî bi 3,7 milyar dolaran ji Kraliyeta Yekbûyî, bi 2,25 milyar dolaran ji Hollandayê, bi 1,83 milyar dolaran ji Almanya, bi 1,8 milyar dolaran ji Belçîka, bi 1,22 milyar dolaran ji Amîriyên Ereb ên Yekbûyî re deyndar e.

Deynê sektora taybet ji welatên Ewropayê re bi tevahî nêzî 130 milyar dolar e. 34 milyar dolar ji welatên Asya, 25,5 milyar dolar ji welatên Amerika deyn kiriye. Balkêş e ku bi qasî deyn hatiye kirin ew qas bazirganî nehatiye kirin û mal nehatiye standin. *ENQERE – DÎHABER*

## Rojnamegerî ne sûc e

Gerînendeyê Giştî yê rojnameya Ozgur Gundemê ya bi biryara KHK'ê hat girtin Zana Kaya û endama Lijneya Weşanê ya rojnameyê Bilge Aykut Contepe ku serbest dihat darizandin, derketin pêşberî dadger.

Midûrê Karên Nivîsan Înan Kizilkaya jî bi hinceta "maşîne û personel tune ne" neanîn dadgehê. Her çend heyeta dadgehê ji bo Înan Kizilkaya bê rûniştina dozê faks şand jî, banga dadgehê bê encam ma. Nivîskar û endamên Lijneya Şêwirê ya rojnameyê Necmiye Alpay û Asli Erdogan ên di 29'ê kanûnê de berbest hatin berdan jî wek çavdêr beşdarî rûniştina dozê bûn. Ji Sefaretxaneya Swêdê jî gelek kes beşdarî rûniştina dozê bûn.

Bilge Aykut Contepe di parastinê de diyar kir ku rojnameya Ozgur Gundemê ji bo vî welatî qezenceke mezin bû û darizandina Ozgur Gundemê şermezar kir.


Zana Kaya jî parastin kir û diyar kir ku van tewanbariyên der barê xwe de qebûl nake. Kaya, anî ziman ku mafê azadiya ramanê wekî sûc hatiye dîtin.

Heyeta dadgehê piştî navberê daxwaza berdanê ya der barê Kizilkaya de red kir. Rûniştina dozê taloqî 14'ê adarê hat kirin. *STENBOL*



## Zem hate ser derman û muayeneyan

**BUHAYÊ DERMAN** û muayeneyan di navbera 20 û 60'an de zem kir. Sendîkaya Karsazên Eczaneyan, bertek nîşan da û xwest li ser wan zem pêş nekeve. Seroka Giştî ya Sendîkaya Karsazên Hemû Eczaneyan Nurten Saydan daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku zema ji sedî 20 û 60 a muayene û dermanan nayê qebûlkirin. Saydan, anî ziman ku ev zem piştî 1'ê Çileya sala nû ket meriyetê û anî ziman ku êdî bêzar bûne ku heqê muayeneyan tahsîl bikin û êdî nikarin zemê ji nexweşan re vebêjin. Saydan, got ku welatiyên nexweş bi awayekî mafdar pirsa 'Ma te ez muayene kirime?' dipirsin. Her îtîraza xwe ji wan re dikin, êdî naxwazin bibin şirîkê van nîqaşan. ENQERE



## Parêzeran îtîraz kir

**JI BO ROJNAMEGER** Omer Çelik, Metîn Yoksu û Derya Okatan ên du di çarçovey lêpirsîna li Stenbolê hatiye destpêkirin de di 24'ê Kanûna 2016'an de hatin binçavkirin û dema binçavkirina wan heta 24'ê çileyê hat dirêjkirin, îtîrazî Dadgeriya Cezaa Sulhê ya Nobedar a Stenbolê hat kirin.

Di îtiraza ku ji aliyê parêzer Ozcan Kiliç ve hat kirin de têkîldarî "binçavkirin, ragirtin û desteserkirina neheq û derveyî hiqûqê" ji bo ku ev biraya Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê bê rakirin û muwekîlên wî bên berdan hat xwestin ku biryara 12'emîn Dadgeriya Cezaya Sulhê ya Nobedar a Stenbolê bê rakirin û rojnameger serbest bên berdan. STENBOL



## Qeyûm xebat rawestandin

Qeyûm Mehmet Şirîn Yaşar xebatên rêyên taxên Adnan Menderes, Sahîlkent û Vanyoluyê rawestandin. Kolanên Erdîşê yên bi berfê hatine girtin nayên paqijkirin. Şêniyên navçeyê ji vê rewşê aciz in.

Welatiyên bi navê Hasan Turkuaz û Medîne Yaşar dan xuyakirin, ku piştî Şaredariya DBP'yî hate desteserkirin, hemû xizmetên şaredariyê hatine rawestandin. Welatiyê bi navê Adnan Ataman jî diyar kir ku beriya 11'ê Îlonê şaredariyê rêyên li taxa wan sererast dikir û wiha got: "Piştî qeyûmê AKP'ê hate ser kar, hemû xebatên şaredariya me yên çêkirina rê û sererastkirina taxan hatin rawestandin. Li herêmê bê navber berf dibare û şaredarî rêyên me paqij nake. Li kûçeyan berf bûye qeşa û welatî gelek mexdûr dibin. Îro sê caran ez bi xwe li ser qeşayê ketime erdê. Divê mehê de ji ber ku berf qeşa girtiye nayê paqijkirin du jin û zarokek ketin erdê û destê wan şikestin." *WAN –ANF*



## Li ser Twitterê gef xwar

Serokwezîr Binali Yildirim, di hesabê medyaya civakî yê Twitterê de peyam şand û hişyarî kir. Yildirim di hesabê Twitterê yê ayîdî serokwezîrtiyê de nivîsa "Cudahiya rêxistinên terorê ji hev tune ye. Armanca tevan ew e ku bêyî dilê wan biêşe mirovan bikujin. Em ji welatiyê xwe dixwazin ku di medyaya civakî de baldar bin. Bila bê zanîn ku gotinên pesnê terorê didin sûc in. Dê bên cezakirin." parve kir. ENQERE

## Li Êlihê kesek hat girtin

Li Kurdistan û Tirkiyeyê li hemberî gel operasyonên binçavkirin û girtinê dewam dikin. Li Êlihê kesê bi navê V.D. ê ku di serdegirtina malê de hatibû binçavkirin piştî karên fermî sewqî dozgeriyê hat kirin. V.D. ji aliyê dozgeriyê ve bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê hat kirin. Dadgehê der barê V.D. de bi îdiaya "endamê rêxistinê ye" da û ew şandin Girtîgeha Tîpa M a Êlihê. ÊLIH

ROJEVA Medya
3 Çile 2017 Sêşem

# Ji gerîlayan peyama li dijî tecrîdê

**Gerîlayên HPG û YJA Starê bertek nîşanî tecrîda giran a li hemberî Rêberê Gelê Kurd Ocalan dan. Gerîlayan da zanîn ku Ocalan xeta wan a sor e û sala 2017'an dê bibe sala azadiya Ocalan û tevahiya gelê kurd**

ZENDA DÎROK / HELGÛRT BAGOK - BEHDÎNAN – ANF

Ji 27'ê Tîrmeha 2011'an û vir ve tecrîdeke giran li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan heye. Gerîlayên HPG û YJA Starê têkildarî vê tecrîda li ser Ocalan ji ANF'ê re axivîn.

Gerîlayên HPG û YJA Starê bang li gelê kurd û hemû gelên demokrasî û aştîxwaz kir ku li dijî îzolasyona li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bê deng nemînin û destnîşan kir ku ji bo azadiya Ocalan ew ê di nav her şert û mercî de tê bikoşin.

Gerîlaya YJA Starê Tolvîn Botan wiha axivî: "Wek milîtanên PKK'ê em tecrîdê tu carî qebûl nakin. Ji bo azadiya Rêberê xwe em ê têkoşîna xwe mezin bikin. Heta ku Rêberê xwe ji girava Îmraliyê derxin û azad bikin, em ê tê bikoşin. Wek gerîlayên YJA Starê, em ê tu carî nehêlin ku dijmin destê xwe bide Rêberê me. Rêberê me xeta me ya sor e."

Gerîlaya YJA Starê Çayan Kurdistan ev tişt anî ziman: "Pêwîst e gelê kurd têkoşîna xwe ya li dijî tecrîdê mezin bike. Em vê dibêjin; bila dewleta tirk dest ji êrîşên xwe yên faşîzan û dijminane yên li dijî Rêberê me berde. Heke rewşek li dijî Rêberê me rû bide, encamên wê dê giran bin. Zivistan, berf, şert û merc çi dibin bila bibin em ê hesabê ji TC'a faşîst bipirsin. Ji ber vê yekê hemû aştîxwaz, hêzên demokratîk rewşa niha ya ku Rêbertî tê de tê girtin, qebûl nekin."

**'EM AMADE NE'**

Gerîlaya YJA Starê Diljîn Amed bal kişand ser girankirina tecrîdê û wiha got: "Gerîlayên ku di nava her şert û mercî de li dijî mêtîngeriyê tê koşiyan, dê li dijî tecrîdê jî bi heman rengî tê bikoşin. Dewleta tirk a faşîst, tecrîda li ser Rêber Apo dişidîne. Tu tişt nikare li pêşiya gerîla bibe asteng. Em gerîla amade ne ji bo azadiya Rêber Apo her tiştî bikin." Gerîlayê HPG'ê Garzan Bîtlîs anî ziman ku bi paradîgmaya Ocalan kurdan xwe ji nû ve afirand û wiha axivî: "Rêber Apo li dijî mêtîngerî û faşîzmê hê jî têkoşîneke mezin dimeşîne. Lazime dewleta TC vê ji bîr neke; em ê hesabê her zerareke li dijî Rêber Apo bipirsin. Hem gerîla hem jî gel, em ê tu carî nehêlin kesek destê xwe bide Rêber Apo."



## Tecrîda li ser Ocalan tê şidandin

ZINARÎN CUDÎ / BEHDÎNAN – ANF

**ENDAMA KOORDÎNASYONA** Partiya Azadiya Jinan a Kurdistanê (PAJK) Jiyan Lava da zanîn ku tecrîda li hemberî Ocalan tê meşandin sal bi sal tê şidandin.

Jiyan Lava bal kişand ser pergala Îmraliyê û wiha axivî: "Ev sîstem roj bi roj tê girankirin. Ji 5'ê Nîsanê û vir ve hevdîtin bi Rêbertî re nehatine kirin. Dewlet bi vê tecrîdê re êrîşî nêrîna Rêbertî dike. Ne tenê ji aliyê leşkerî ve, ji aliyê siyasî ve jî êrîş tê kirin. Êrîşeke îdeolojîk jî li Rêbertî tê kirin."

Lava da zanîn ku bi rêya vê tecrîdê hewl tê dayîn vîna gel teslîm bê girtin û îşaret bi berxwedana dîrokî ya 17 salan a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kir. Lava wiha axivî: "Kes nikare pêşî li nêrînên Rêbertî bigire. Ji bo rakirina tecrîda giran a niha, wek tevger em ê vê rewşê wek rewşeke ji rêzê nebînin."

Lava da xuyakirin ku çawa ku Ocalan bi kûrahiya nêrîna xwe sîstema Îmraliyê tevizand, divê ew jî wek gel û tevger, tecrîdê û şerê psîkolojîk bê kêr bikin û wek Tevgera Azadiyê ya Jinan ji her demê bêhtir têkoşîna xwe xurtir bikin.

Jiyan Lava wiha got: "Girîng e azadiya Rêbertî bibe bingeha karên me. Divê xebatên me û serkeftinên me xizmetê ji azadiya Rêberê me re bikin. Hemû milîtan û welatparêzên vê tevgerê û gelê kurd ê welatparêz divê bi hev re bikevin nava tevgerê û xwedî li Rêbertî derkevin."

Lava îşaret bi çalakiyên ji bo azadiya Ocalan kir û da zanîn ku jin dê pêşengiyê ji van çalakî û berxwedanê re bikin. Lava wiha axîvî: "Divê jin û ciwan pêşengiyê ji çalakiyên serhildanê re bikin. Ji her demê bêhtir divê em jin xwedî li azadiya Rêbertî derkevin. Em sîstema Îmraliyê hilweşînin û tecrîdê rakin. Rewşa tenduristiyê ya Rêberê me nebaş e û jiyana wî ne ewle ye. Eger li Tirkiyeyê faşîzm di vê astê de di nava tevgerê ye û di rewşeke gelekî tengav de ye, hingî ewlekariya Rêberê me di garantiyê de nîn e. Ji ber vê yekê divê kar û têkoşîna me xizmetê ji azadiya Rêbertî re bikin."

## PDK gefan li welatiyan dixwe

**Îsa Barzanî yek ji welatiyên herêma Barzan e. Demek berê hatibû revandin û diyar kir ku dîsa gef li wî tên xwarin.**

**Îsa Barzanî wiha axivî: "Sala derbasbûyî ez hatim girtin û piştî çend mehan ez hatim berdan. Niha jî carek din bi rêya peyamên cuda êrîş li ser min tê kirin û dibêjin em ê te birevînin. Tenê ji ber ku nêrînên min cuda ye, ez niha ji raya giştî re dibêjim tu pirsgirêkeke şexsî û civakî ya min nîn e. Tişta were serê min tenê ji bo ku min nêrînên xwe gotine û tiştek din nîn e."**

**Îsa Barzanî di 5'ê Tebaxa 2015'an de, ji aliyê asayîşa PDK'ê ve li herêma Barzan ji ber sedema ku bi rêya tora civakî Facebookê wêneyekî Rêberê PKK'ê Abdullah Ocelan û Serokê YNK'ê Celal Telabanî parve kiribû, hatibû revandin. Piştî zexteke zêde ya medyayê û nerazîbûnên rêxistinan di 29'ê Çileya 2016'an bi mercê bêdengbûnê hat berdan.** HEWLÊR – ROJNEWS



## DBP bi rûspiyan re civiya

Rêxistina DBP'ê li Amedê bi rûspiyan re li Salona Konferansê ya Vedat Aydin civînek li dar xist.

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), endamên Meclisa Dayikên Aştiyê, parlamenterên HDP'ê yên Amedê Sîbel Yîgîtalp, Nîmetullah Erdogmuş û Ziya Pîr beşdarî civînê bûn. Têkîldarî geşadenên diqewimin endamê MYK'ê Omer Onen axivî.

Onen wiha got: "Di vê demê de tiştên ku diqewimin bandorê li hemû zindiyan dikin. Her ku diçe sîstem ber bi xirabiyê ve diçe. Polîtîkayên qirêj ên ku li herêmê tên afirandin em ê bi hev re derbas bikin. Ji bo tiştên diqewimin yekitî divê. Em ê ji niha û pê ve biçin gund û bajaran û biaxivin. Li Amedê her pirsgirêkek bandorê li me dike. Roj bi roj li dijî civak û zarokan polîtîkayên qirêj tên meşandin. Ev jî bandorê li hemû kesan dike. Kî çareseriyê bibîne, dîsa em ê bibînin. Bi hatina cem hev em ê pirsgirêkên xwe çareser bikin."

**BERPIRSYARÎ DIVÊ**

Parlamenterê HDP'ê Erdogmuş jî diyar kir ku ji ber berpirsyariya li hemberî civakê pêwîstiya welat bi gel heye, pêwîstî bi komên ku pirsgirêkên civakî analîz dikin û dibin encamê heye. Erdogmuş destnîşan kir ku di dema pêxember de newekhevî, faîz û dek û dolab, nehiqûqî hebû û pêxember ji ber vê yekê gelek aciz bû û ev pirsgirêk wekî pirsgirêkên xwe dîtine û ketiye nava lêgerînê. Erdogmuş wiha axivî: "Îro jî em ê van pirsgirêkan çawa çareser bikin, pêwîstiya me bi we heye. Ev kom ji aştiya civaka xwe berpirsyar e. Rojeva welat heye. Hûn dorpêça ku partiya me pê re rû bi rû ye dizanin. Ji hevalên me yên meclisê heta welatiyên li kolanan em di bin tehdîteke çawa de ne, hûn dizanin. Pirsgirêkên me zêde ne lê divê em moral û piştgiriyê bidin civakê. Pêdivî bi pêşniyarên rûspiyên civakê heye. Divê hemû kes berpirsyariya ku dikeve ser milê wan du qatî bi cih bîne."

**YEKITÎ GIRÎNG E**

Endama MYK a DBP'ê Fatma Gul jî anî ziman ku di dîrokê de gelê kurd di her pêvajoyê de xwe parastiye û hatiye van rojan, di vî pêvajoya dijwar de jî li dijî êrîşên li hemberî ziman, çand, hebûna xwe tu caran serî netewandiye. Gul wiha axivî: "Ev pêvajo ji bo kurdan gelek girîng e. Li çar parçeyên Kurdistanê niha pêdivî bi yekitiyê heye." *AMED*

## 'Divê şerê navxweyî xeta sor be'

DANA OMER / SILÊMANÎ - ROJNEWS

**Li başûrê Kurdistanê piştgiriya ji bo banga KCK'ê ya ji bo pêkanîna kongreya neteweyî zêde dibe. Di heman demê de bertekên li dijî daxuyaniyên Nêçîrvan Barzanî ku gotibû 'ger hêzên PKK'ê ji Şengelê dernekevin em ê hêzê bi kar bînin' jî zêde dibin.**

**Endamê Rêveberiya Yekgirtû ya Îslamî ya Kurdistanê û di heman demê de berpirsê Ofîsa Yekgirtû ya Îslamî ya Silêmaniyê Osman Karwanî der barê daxuyaniyên Nêçîrvan Barzanî de axivî û wiha got: " Divê tu caran daxuyaniyên der barê şerê navxweyî de neyên dayîn, ji ber ku ev ne di xizmeta doza gelê kurd de ye." Kawanî da zanîn ku ji şerê birakujiyê ders nehatine derxistin û pêwîst e şerê navxweyî ji bo tevahiya alî û partiyên kurd xeta sor be.**

**Karwanî destnîşan kir ku pêwîst e lihevkirin û nêzîkbûnek di nava PKK û PDK'ê pêk were û wiha axivî: "Ji hemû demê zêdetir pêwistî bi Kongreya Neteweyî û yekrêziyê heye. Partiyên kurdan nekarîne stratejiyeke hevbeş ji bo karên hevbeş di nava xwe de diyar bikin, partiyên kurdan ew qasî ji derve re li hev kirine, ew qas di nava xwe de li hev nekirine. Hinek kes berjewendiyên malbatê û yên kesî digirin li ber çavan, ev rewşa Herêma Kurdistanê ye, parlamentoyeke me hebû ew jî hate bêbandorkirin."**

www.arsivakurdi.org

JIYAN AMARGÎ / BEHDÎNAN - ANF

Endamê Konseya Leşkerî ya HPG'ê Nûman Amed, bi têkoşîna xwe ya şoreşgerî ya ku li Amedê dest pê kir, dîsa bi têkoşîna xwe ya azadiyê ya ku li Amedê da, bû efsane.

Ji 1993'yan bi tevliîbûna xwe ya nav têkoşînê heta şehîdbûna xwe ya di sala 2012'an de, bi şêwaza xwe ya şer a li ku li dijî dewleta tirk da, bû yek ji fermandarên pêşeng ên Şerê Şoreşgerî yê Gel.

Fermandar Nûman Amed bi têkoşîna xwe dibe fermandarê pêşeng ê **Pêngava 1'ê Hezîranê û di dema şerê şoreşgerî de jî dibe fermandarekî mînak.** Amed bi têkoşîna xwe ya salan dibe mînaka fermandariya pêşeng li Kurdistanê



# Fermandarê pêşeng NÛMAN AMED

Fermandar Nûman Amed ku li qadên şer navê berxwedana bênavber bû, di 1973'yan de li Bismîla Amedê tê dinê. Li malbateke rewşa wan nexirab ku nirxên feodalî û dînî lê serwer bû, mezin dibe. Amed ku heta pola dawîn a lîseyê dixwîne, qet dernakeve derveyî Kurdistanê. Li gel hemû polîtîkayên mêtingeriyê yên dewleta tirk ên li Kurdistanê, bi ser gelê kurd de jî dev ji welatê xwe bernade. Her kêlîka ciwantiya xwe, di nav gelê xwe de, girêdayî kevneşopiyan, bi çanda xwe li Amedê derbas dike. Ji ber ku li nav derdoreke welatparêz mezin dibe ne xerîbî PKK'ê bû, dawiya lîseyê dest bi lêgerîna şoreşgerî dike gerîla Nûman Amed. Li ser rastiya kurd zêde difikire. Li hêlekê polîtîkayên pişaftinê yên dewleta tirk û jiyana sîstema kapîtalîst a ku dide ciwantiyê, ya hundirê wê qewartî. Li hêla dî jî rastiya jiyanê ya wî û têkoşîna azadiyê. Tercîha xwe dike. Di 1993'yan de li Amedê bi sê hevalên xwe re, dawiyê li jiyana xwe ya lîseyê tîne û tev li Têkoşîna Azadiya Kurdistanê dibe.

### WATEYA GERÎLATIYÊ

Fermandar Nûman Amed, piştî ku tev li nav refên PKK'ê dibe, hîs û ramanên xwe wiha parve dike: "Dema ku me biryar da ku tev li nav gerîla bibin, me bi hevalan re digot em 6 mehan bijîn besî me ye. Me gerîla di serê xwe de di nav mewziyan de, di nav sahneyên şer de zindî kiribû. Me têkoşîn tenê bi çekdarî û mirinê disêwirand. Piştî ku em tev lê bûn, me dît ku ne wisa ye. Me dît ku em pir teng nêzîk bûne. Me dît ku di PKK'ê de têkoşîna esasî ya felsefî, îdeolojîk ye ku ji hêla Rêbertiya me ve hîmê wê hatibû danîn. Me fêm kir ku dema wê hat divê gerîla çekdarekî zîrek, ku dema wê hat divê îdeolog û felsefevanekî/e zîrek be. Beriya her tiştî em hêviya gelê xwe bûn. Ji bo gelê xwe yê hêja, ji bo ku em jiyaneke azad bidinê, em tim fedaiyên amade bûn. ”

### TÊKOŞÎNA BÊHEMPA

Fermandar Nûman Amed ku jiyana xwe ya gerîlatiyê ya 3 salên pêşî li Amedê derbas kir, di van salan de di nava xwe de bi xwe re muhasebeyekê derbas dike. Difikire ji bo ku bibe mîlîtanekî şayanî PKK'ê û gelê xwe divê çi bike. Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê berxwedaneke mezin û kûr dixwaze. Ew wêrekiya xwe ya nîşandana berxwedanê û bê ka heqê doza xwe dide yan na, dide ber pirsan. Ji ber ku salên 90'î dema ku ew tev li nav têkoşînê dibe, salên ku vîna PKK'ê wek tevger dihate ceribandin bûn. Dewleta TC'ê bi dirûşma 'em ê hemûyan biqedînin' li dijî tevgera PKK'ê şerê giştî yê tunekirinê dabû destpêkirin. Di navbera dewleta tirk û PKK'ê de şerekî dijwar dest pê kiribû. Wan salan ji hêla dewleta tirk a mêtinger ve li Kurdistanê gelek gund tênê şewitandin. Bi dehan mirovên sivîl tênê qetilkirin. Li dijî vî şerî gerîla li çiyan şer dikir û gel jî li bajaran radibû serhildanan. Kurdistan bi giştî dibe qada şer. Di vî şerî de têkoşîna azadiya kurd bi ser dikeve. Fermandar Nûman Amed bi taybetî sala 1994'an wek saleke pir dijwar bi nav dike.



### HEVDÎTINA OCALAN

Gerîla Nûman 1996'an ji hêla Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve bang lê tê kirin ku biçe Şamê. Dema nû dibihîze ku ew ê biçe Şamê, cihê ku Abdullah Ocalan lê ye, kelecanî û şadiya xwe di bîranînên xwe de wiha vedibêje: "Ji bo min surprîzeke mezin bû. Ne pêkan e ku ez wê kêliyê ji bîr bikim. Ji bo perwerdehiya rêbertiyê, ji min re hate gotin ku ez ê biçime Şamê. Dema ku min ev nû bihîst ez şok bûm. Ji kelecan û kêfxweşiyê min nizanîbû ez ê çi bertekê bidim û çi bibêjim. Tenê şad bûm. Hevdîtina Rêbertiyê, li ber destê wî perwerdebûn, ji bo min tiştekî bêhempa bû. Lê ez hê nû me. Hevalê berê hene. Min got, beriya min heqê wan e. Hevalan ji bo ku ez wiha difikirim, ji min re got tu şaş î ku Rêbertî bang kiribe ew bi tiştekî dizane helbet û gotin divê tu wiha nefikirî. Vê moralek da min. Wê demê ku perik bi min ve hebûna ez dibêjim qey ez ê bifiriyama. ”

### KÊLIYA HEVDÎTINÊ

Ber bi Şamê ve ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan lê ye, dest bi rêwitiyê dike. Fermandar Nûman Amed kêliya pêşî ya ku Ocalan dibîne wiha tîne ziman: "Min digot li pêş Rêbertî, teqez ez ê ji kelecanê ji hiş bikevim. Ew kêliya ku bi rojan min xeyala wê dikir, hîç wekî ku ez difikirîm nebû. Rêbertî çend sirûştî û ji dil bû. Xwedî nêzîkatiyeke wisa bû ku mirovên li pêşberî xwe rehet dikir, moral didayê. ”

### HELWESTA MÎNAK

Fermandar Amed bi daxwaza xwe payîza 1997'an dîsa berê xwe dide eyaleta Amedê. Perwerdehiya ku dîtiye di şer û têkoşîna jiyanê de rê li ber guherînên girîng vekiribû. Di sala 1998'an de piştî ragihandina agirbestê ya ku ji hêla Ocalan ve bi yekalî hate ragihandin, derbasî qada başûrê Kurdistanê dibe. Li vê qadê jî li gelek qadên şer ên wekî Zagros, Qendîl, Xinêre, Metîna dimîne. Di 1999'an de piştî komploya navdewletî ya bi ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de dest pê dike, di nav PKK'ê de tasfiyekariya navxweyî dest pê dike. Amed, di van salên dijwar û krîtîk ên Tevgera Azadiya Kurd de, li dijî tasfiyekariya navxweyî şer dike û helwesta mînak a mîlîtanên PKK'ê nîşan dide.

Di pêvajoya 'Şerê Şoreşgerî yê Gel' de ku PKK'ê di 2012'an de dabû destpêkirin, Nûman Amed jî cihê xwe digire. Wek Fermandariya Eyaletê û Endamê Konseya Leşkerî ya HPG'ê tev li nav şer dibe. Ji bo Fermandar Nûman Amed êdî tu girîngiya dijwarbûna şert û mercan nebû. Ji ber ku wî jiyana xwe ya gerîlatiyê tim di şert û mercên herî dijwar de, di şerê giran de derbas kiribû. Di şerê şoreşgerî yê gel de jî hay ji berpirsyariya li ser xwe hebû. Amed û hevrêyên wî bi çalakiyên xwe ya pêvajoyê re dibine bersiv.

## 'Rêbertî şerê jiyanê temam kir'

**NÛMAN AMED PIŞTÎ** perwerdeya ku li Şamê dît, guherînên ku di karekterê wî de çêbûn wiha anîbûn ziman: "Dema perwerdehiya Rêbertiyê şerê başûr pêk dihat. Ji her hêlê ve bi ser Rêbertî û rêxistina me de êrîş hebûn. Rêbertî li gel ew çend êrîşan jî tim di nav kûrbûnekê de bû. Her kêlî bi awayekî herî baş dinirxand. Ew di her pêvajoyê de li ser xwe bû. Di ruh û fizîkê de tim pir xurt bû. Du dewreyên perwerdehiyê yên ku min Rêbertî dîtin, helwesta min, nêrîna min a jiyanê guherand. Beriya ku ez Rêbertî nas bikim, min şer tenê wek şerê çekdarî fêm dikir. Min digot li eniya ku şer dikim ez ê heta bi deverekê biçim û piştre şehîd bibim. Ango min bi wê kêmasiya xwe derxist ku ez li pêş nafikirim, hesab nakim, bi berfirehî nafikirim. Rêbertî bi me da fêmkirin ku divê em bêhtir bijîn û bêhtir li dijî dijmin tê bikoşin. Diviya em bijiyana. Bi jiyanê diviya me hemû êrîşên faşîst û qirker ên dijmin têk bibirana. Ji ber ku şerê me şerê jiyanê bû. Şerê me şerê mirovahiyê bû. Dema ku ez tev li nav jiyana gerîla bûbûm nêrîna min a li jiyanê guherîbû lê hin tişt kêm diman. Rêbertî şerê jiyanê yê ku di min de kêm bû, temam kir. ”

## Fermandarê Pêngava 1'ê Hezîranê



**SALÊN 2000'Î DI NAV PKK'Ê DE** ew sal bûn ku tesfiyekariya navxweyî û derve pir zêde bûbû. Li dijî şerê dewleta tirk û hêzên din ku hem li derve û hem jî ji hundir ve li dijî PKK'ê dikirin. 'Pêngava 1'ê Hezîranê' tê destpêkirin. Li hemû deverên ku gerîla lê ne, li dijî tesfiyekariya navxweyî û derve berxwedaneke mezin dest pê dike. Fermandar Nûman Amed, Pêngava 1'ê Hezîranê jî dîsa li eyaleta Amedê pêşwazî dike ku şer li wir giran dibe. Nûman Amed ku xwe û yên di bin fermandariya xwe de bi awayekî herî serkeftî ji şer re amade dike, di Pêngava 1'ê Hezîranê de performansa herî zêde nîşan dide. Ji bo ku pêngav bi ser bikeve encama ku tê hêvîkirin tê bidestxistin. Nûman Amed jî dibe fermandarekî pêşeng.

## Di 31'ê kanûnê de şehîd dibe

**DI 31'Ê KANÛNA** 2012'an de berê sibehê, li Hênê, Licê ya Amedê û Dara Hênê ya Çewlikê artêşa TC'ê ya dagirker bi ser yekîneya gerîla de ku Fermandar Nûman Amed jî di nav de bû, operasyona îmhayê dide destpêkirin. Li dijî vê operasyona bi temamî bi armanca îmhayê hatibû destpêkirin, Endamê Konseya Leşkerî ya HPG'ê Nûman Amed û 10 hevrêyên xwe berxwedaneke bêhempa nîşan didin û jiyana xwe ji dest didin.

# Serra 2016 apey de mende

**Wisar yeno heme ganîyî gonîya xo bedilnenî û ganî benî. Wisar yeno heme dar û ber pûndê xo rişnenî, vilika xo akenî û heme cayî xemilyenî. Aşma wisarî xeyrên a, zerên a. Wa serra 2017 heme şarê ma rê xeyrên û bimbarek bo**

ZAZA CEBELÎ

Serra 2016 de zahf çîyê muhîmî qewimîyayî. Nê qewimîyayîşan mîyan de yê tewr muhîm zî Kantonê Rojawanî bî. Rojawan de bitaybetî şarê kurd û sewbîna şaran verba wehşetê çeteyanê DAIŞî de destanê qehremanî nuştî û hema zî nusenê. Serra 2016 morê xo da serkewtişê Rojawanî ro û xelasnayîşê Şengalî. 2016 de qewimîyayîşî bînî zî xoverdayîşê îdareyê esasî Sûr, Farqîn, Cizîr, Nisêbîn, Şirnex, Colemêrg de xoverdayîşê destanê dîrokî ameyî nuştiş.

Nê xoverdayîşê destanê qehremanî her wext tarîxê kurdan de nexşê muqadesî reyde yenê nuştiş û cayê xono xusûsî tepîşenê. Serra 2017 bena fînalê Rojawan û Vakûrê Kurdistanî. Nê warî de wa ti kes nêkewo rewşa bêhêvî. Na serra 2017 bena serkewtişê kurdan û heme şarê bindestan. Rojhelato Mîyanên de kayê kişikî kay benê û nê kayê kişikî de kurdî hemleyanê muhîman kenî. Hem texteyê kişikî ser de û hem zî yew bi yew şerî mîyan de nê hemleyan îcra kenê. Rojhelato Mîyanên de heme hêzê emperyalî yê girdî wazenê ke sernawera xêzî nexşî xêz bikerê.

La enka zerrîya şorişî Rojhelato Mîyanên de û Rojawanî de erzena. En helqaya rêza zeyîf Rojawanî de qerfîyaye û na rêze heme Rojhelato Mîyanên de vila bena. Vakûrê Kuristanî de kozîya kilaya adirî her roj hîna zaf xemilîyena. Na kilaya şorişî ya adirî ver bi pawitişê teqayîşî de ya. Kam wext, kam rojî de teqîyena rewşa limitî de ya.

Şewa serrneweyî ya 2017 de ancî rewşa qirkerdişî ra vîyarte. La çi heyf o ke nê teqayîşî ke bi nameyê çeteyê DAIŞî ra benê, pêro zî vera kurdan de ameyî viraştiş û nazî vera xerîban, ejnebîyan de ameyî viraştiş.

La nê qirkerdişî pêro tesadufî nêbî. Qirkerdişê Pirsûsî, Anqara, Edene, Amed, Dîlok, Sultanahmet û Ortakoy. Nê qirkerdişan ra bi tena Sultanahmet û Ortakoy de kurdî çinêbî.

La nê wirdî qirkerdişan de xerîbî û ejnebîyî bîy. Yanî ewta de yeno vatiş ke nê heme qirkerdişan de, DAIŞ bi xo nê teqayîşan nêviraşto. Eke bi xo biviraştê, ganî verê verkan leşkerê tirkan û polêsê tirkan hedef bigirotê.

Yew qala Tayyîpî esta, her wext fekê xo de hewayê vîncî caweno û hesaban ra qale fîneno Ewropa û vano: "Şima marî veradî xo de weye kenê, la eke yew roje no mar zêlîya xo şima de dano." La kam eyro marî veradîya xo de weye keno, zaf eşkera yo. Vizêrî bekaya na dewlete vera kurdan de Hîzbullahî gurênay la eyro HUDA PAR û çeteyanê DAIŞî vera kurdan de gurênenê.

Wexto ke ma tarîxê Tirkîya ra ewnênê Teşkîlatê Mahsûsa ra heyana eyro Tirkîya nê MÎTî û çeteyê xo weş gurênayî. Wextê Osmanî de seba textê Sultaney ra birayî bira kiştê û pîyî ewladê xo kiştê.

Serra 1993 de Tirkîya seba kayê xono gemarî ra çend generalê xo û albayê xo kiştî. Tirkîya nê warê gemarî de zaf westa ya. La eyro Tayyîpî veba kurdan de heme qoz û gemarê xono taybetî pêro gurênay.

Eyro zî milayî û hesaban ra nuştoxî fetwa danê û nê fetwaya xo de vanê: "Kam HDPîyan bikişo qetlê înan wacîp o û eke nazî PKK ra nêwanê teror na bikişê û nazî bikerê zindan." Seba serrneweyê Noelî ancî Dîyanet û muftî fetwa danê û vanê: "Noel yê ma nîyo yê şeytanan o." Nê fetwayî dima ra zî orteyê Stenbolî Ortakoy de qirkerdiş virazîyeno. La nê pêro qewimyayîşî tesadûf nîyê. Senî hewa orteyê Stenbolî de qirkerdiş virazîyeno û no qetilkar polanê xo têşaneno û remeno? Nê heme senaryoyî rewşa gemarinî ra ameyî viraştiş.

Her rewşa kaos û krîzî de yew peynî esta û enka zî peynîya Tayyîpî ameya. Nê 15 serrî yo ke Tayyîpî nê welatî hewayê hêgayê xo, hewayê ciwênê xo kut û pelixna.

Enka zî vano pergalê Serokey bidê mi nazî hukmatê koalîsîyonî reyde gure nêbeno û kaos virazîyeno. Sankî heyana eyro koalîsyon bî û nazî muxalefet bî? Nê heme hîkayeyê Tayyîpî ra şar senî hewa xapîyeno, no zî yew çîyo ecêb o? Eke nê welatî de her roj qirkerdişî virazîyenê û nê qirkerdişan de bi hezaran ra merdimî kişîyay û hema zî ne Serekwezîr û ne zî Wezîrê Zereyî îstîfa nêkeno.



En çîyo ecêb zî qet ne yew çapemenî, yew roşnvîr û nuştox nêvano qey yew îstîfa nêkeno? Bi tena yew çete mendo û no çete heme qeraran dano. Rewşa Tirkîya zî her wext binê tehluke de ya. Muxalefet zî hewayê bizêka bêwexte bêçare bareno. Tayyîpî kindirê Bahçelî û bizêkê bêwextî giroto binê destê xo û kay dano. La ti senî muxalefet î Kemal Kiliçdaroglu û bizêko bêwext?

Roje yeno dewran vêreno. Roje yeno, hesap yeno persayîş. La zimistan serd û pûk o û wesar paweno. Wesar yeno heme ganîyî gonîya xo bedilnenî û xo sernawera ganî keno. Wesar yeno heme dar û ber pûndê xo rişneno, vilika xo akeno û heme cayî xemilyenî. Aşma wesarî xeyrên a, zerên a. Wa serra 2017 heme şarê ma rê xeyrên bo û bimbarik bo.




# *Derheqê romanê Sosine û Gulîzare de*

ALÎ BEYTAŞ

Ez û roman, ma bacarê Mersînî de bîyîme nasê jûbînî. Ma xeylê wext henî yewbînî de nîyada vinetîme. Kitabanê kirmanckî mîyan de kitabêde xeylê qalind bî. La kifş bî ke zereyê xo de xeylê çîyê muhîm û meqbulî estê.

Ma pîya standê kitaban de vinetîme û ameyîş û şîyayîşê însanan de nîyada. Ne romanî mi ra ne kî mi roman ra çîyê pers kerd. Ma tam hîrê rojî "Çocuk Parki" ya Mersînî de vinetîme. Ne kesî mi ra ne kî hevalê mi romanî ra çîyê pers kerd. Kifş bî ke qewmê zazayan wendiş ra hes nêkerdêne. Şanê roja hîreyî, ma "Çocuk Parkî" ra xatir waşt û şîyîme komela Kurdî Der.

Romanî mi ra, mi kî ey ra hes kerd. Çend rojan ra dime mi dest pêkerd û wend. Roj bi roj nasîya min û romanî bîye xorîne. Ez bîyo hevalê romanî, qehremanê zereyê romanî kî bî hevalê mi. Wext vîyart, nasîya min û qehremananê romanî xo vurna û ma bîyîme sey yew dost. Ez ge-ge bîyo birayê Sosine, ge-ge bîyo birayê Gulîzare. Mi ge-ge Memê Xase ra xuye kerd, ge-ge bi halê ey xemgîn bîyo. Ge-ge mi Cemê sûrî ra nefret kerd, ge-ge ci rê xemgîn bîyo. La merdişê Cemê sûrî mi rê xeylê zor ame. Ez ge-ge bîyo hevalê gerîllayan, mi koyan de raywanîye kerde, ge-ge merdişê înan rê zereyê mi bî lete. Mi xo xo de va: xwezikêna gerîllayî memerdêne. Xwezikêna zayîyatê xo dahîna şenik bîyêne. La no destê nuştoxî der o. Ma nuştox vatena mi keno, pîyê mi.

Hîkayeya romanî bêqusur a. Rêzkerdîşê qehremana û tekîlîya xo bêqusur a. Ca bi ca babetê hîkaye jûbînî ra bi astare ameyê cîyakerdiş. Xwezikêna cîya mekerdêne. La ez nêeşkîno karê nuştuxî ra qisey bikerî. Xora o zano. Yê mi teyna ke vatiş o.



Ez bawer keno rîpelo 161. de cayê qehremanê "Rizo Sûr" de "Memê Xase" nusîyo. Belkî kî ez xelet o.

Roman, herçiqas ke tayê bidetay nusîyo kî, bêqusur o. Qalindîya xo belkî kî wendoxî tersnena. La demo ke ame wendiş, wendox tersê xo birneno û beno nasê qehremananê zereyê romanî.

Mi to ra zaf hes kerd, romanê "Sosine û Gulîzare." Heq zarawaya to de bo. Heq çekuyanê zereyê to de bo. Heq ziwanê zereyê to de bo. Heq dest û payanê nuştoxê to Îlhamî Sertkayayî de bo.

Destê to tern bê, birayo delal. Zaf sipas keno.

# 9 aşmî yo ke paweyê cenaze ya

**Dayîka Abdullah Ako ke wextê qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan ya Nisêbînî de hetê hêzê dewlete ra amebî kiştiş, Ayten Ake ya ke 9 aşmî yo ke cenazeya lajê xo pawena, va: "Ez wazena lajê mi bireso herra ke ci ra zaf heskerdêne"**

Nisêbîn de 14ê adare de qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan amebî îlankerdiş û dima ra hêzê dewlete hêrişê taxanê Dîcle, Firat, Yenîşehîr, Abdulkadîr Paşa, Zeynel Abîdîn û Kişla kerdbî. Hêrişan ver bi desan ciwanî merdbî û keyeyê ciwanan hîna zî cenazeyanê xo nêgirewtî. Hêrişan ra dima 6 taxê ke tede xoverdayîşê xoserîye amebî nîşandayîş, hetê hêzê dewlete ra ameyî/yenî rijnayîş.

Nê keyeyan ra yewe zî keyeyê Abdullah Akî yo. Abdullah Ak zî Nisêbîn de wextê qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan de hetê hêzê dewlete ra amebî kiştiş û 9 aşmî yo ke cenazeya Akî teslîmê keyeyê ci nîno kerdiş. Babete ser o dayîka ci Ayten Ake û waya ci Dilşah Ake qisey kerdî.



**WA BIRESO HERRA XO**

Dayîke Ake va 'lajê mi rayîrêko birûmet de têkoşîn da û merd' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Ez wazena wa yew mezelê ci bibo û ez biresa kateyanê ci. Eke ez bizanba laşê ci kura de yo û bişînba zîyaret bikera, o wext do tay boya mi biaba. Ez Dîlok, Mêrdîn û zaf morgê nêweşxaneyan de lajê xo gêraya. Wexto ke ma persê cenazeya xo kenî, vanî 'çin o'. Ez reyna agêraya, taxan de lajê xo gêraya, la mi nêdî. Cenazeya lajê mi hîna taxan de yo, an dewlete girewto, ez nêzana. 9 aşmî yo ke ez cenazeya lajê xo gêrena. Lajê mi seba herra xo şer kerd û ma wazenî ke wa laşê ci bireso herra ke lajê mi ti ra zaf hes kerdêne. Wa no dej zerrîya ti kesî de nêmano."

**SEREYÊ MA BERZ O**

Waya Abdullahî Dilşah Ake zî va 'birayê mi nê erdan ra zaf heskerdêne û seba nê erdan têkoşîn da' û wina dewam kerde: "Cok ra ganî laşê birayê mi bireso, herra xo. Birayê mi Abdullahî vatêne 'Nisêbîn erdê ma yo, ma nêeşkenî erdê xo ra biaqityî.' Waştiş û heskerdişê merdimêko winasî resayîşê herra xo yo. Ma zî sey merdimanê bînan wazenî biresî cenazeya birayê mi. Ma wazenî sax o û an merde yo, bimûsî. Eke birayê mi merdo zî, ma wazenî cenazeya ci bivînî û mezelê ci zîyaret bikerî. Têkoşînê Abdullahî ver sereyê ma berz o û ma wazenî reya peyên ci bivînî." ***MÊRDÎN - ŞÛJIN***

## Polîsan cinîya ke şîdet dîyêne kerd ajan

Cinîya bi nameyê S.K ya ke par zewejîyaye û bi no hawa mêrdeyê xo reyde Bedlîs de bica bîyî. S.K seba ke mêrdeyê xo ra şîdet vînayêne xo muracatê Mudirîya Asayîşî ya Norşînî kerde.



Polîsan îstîxbarat girewt ke S.K zaf reyan şîya partîyê HDP û DBPyî. Goreyê îdîayan polîsan S.Kye rê ajantî pêşnîyaz kerdo û aye rê wina vatî: "Eke ti derheqê HDP û DBPîyan de zanayîş bida ma, ma do to bikerî binê pawitişê dewlete û ma do to mêrdeyê to ra bifeletnî."

Goreyê îdîayan badê pêşnîyazê polîsan S.Kye derheqê HDP û DBPyî de zanayîş daya polîsan, dima ra zî seba pêserkerdişê xeberan serbest ameya veradayîş.

S.Kye derheqê mêrdeyê xo û zaf kesan de zanayîş daya polîsan. Badê îfadeyê S.Kye hemşaredarê Norşînî M. Emîn Ozkan, Sureya Ata, Nazîme Avras, Hemserekê Şaredarîyê Bedlîsî Nevîn Daşdemîr, Huseyîn Olan û bi desan kesî ameyî tewqîfkerdiş. Goreyê îfadeyê S.Kye ke vato, 'mi bi çimanê xo dî ke pere dayî rêxistine' hemşaredarî tewqîfkerde yî.

**MA NÊZANÎ ÇI ESTO**

Avûkatê ke ewnîyenî dosya zî wina vanî: "Seba îfadegirewtişî xeber nêdayî ma. Ma nêzanî ke îfadeyê na cinî senî ameyo girewtiş. Seba ke dosye de qeraro nimiteyî esto, ma nêzanê ke mîyanê dosya de çi ca gêno. Îfadeyê merdimêko winasî do çend raşt bibo. Eke qerarê nimiteyî dosya ser ra bêro wedarnayîş ma do zanayîş bidî raya pêroyî." ***BEDLÎS - ANF***

## Mazot mekteban rê yeno vilakerdiş

BEŞAR HEMDAŞ / HESEKÊ – ANHA

Komîteya Îdarekarîya Mekteban ya bajarê Hesekê, seba ke mektebanê herême de bêrî vilakerdiş û lazimîya mekteban ya germîye bêro peydakerdiş, beşa yewine ya mazotê Îdarekarîya Mektebê ke herêma Şedadî de yî rê erşawit,. Heyetê Perwerde û Musnayîşî yê Kantonê Cizîrî verê cû zî mektebanê herêma Şedadî rê sobayî vila kerdbî.

Komîte 24 hezar lître mazot herîna û no mazot do 60 mekteban rê bêro vilakerdiş.

Babete ser o Hemserekê Komîteya Îdarekarîya Dibistanan a Şedadî Ehmed El-Xidirî qisey kerd.

**XEBATE DEST PÊKERDE**

El-Xidirî derheqê babete de va 'Mazoto ke seba vilakerdişî ameyo herînayîş, beşa ci yê yewine nika 60 mekteban rê yeno vilakerdiş' û qiseykerdişê xo wina domna: "Her mekteb rê 56 lître mazot yeno vilakerdiş. Heta nika seba ke tayê mekteban de varîlî çinêbî û no zî vernîya vilakerdişî de bî asteng. Xebata vilakerdişî ameya destpêkerdiş."



Ehmed El-Xidirî sipasîya xo seba Komîteya Îdarekarîya Mekteban a bajarê Hesekê û Heyetê Perwerdeyî yê Kantonê Cizîrî kerd.

Mamoste Emşe Husên El-Ewade zî sipasîya xo seba xebatê Komîteya Îdarekarîya Mektebê Hesekê ke lazimîya mazotî pê ard, kerde.

## Ma do hetkarî bidî heme kesê ke bêkeye yî

ALVA OSÎ / SILAVA ÎBRAHÎM / HESEKÊ - ANHA

Endamê Meclîsê taxa Miftî yê bajarê Hesekê, Mihemed Nezîr û cinîya ci Mihdîye Elîye rê keye herînayî. Mihemed Nezîr û Mihdîye Elîye dewa Hesekê de cuyayêne. Keye serra 2012 de dewe ra koçê taxa Miftî ya Hesekê bîyî. Vera varayîşê varanî yê zêde serkeyê keyeyî ame war û Mihemed Nezîr û Mihdîye Elîye bêkeye mendî. Keye seba hetkarîye mecburî muracatê Komunê taxa Miftî kerd. Komunê taxe zî waştişê keyeyî resna Meclîsê Taxe. Meclîs zî bi îmkananê xo keyeyêk Mihemed Nezîr û Mihdîye Elîye rê herîna. Endamê Meclîs û Komunî pîya keye pak kerdî û ca dayî eşyayan.

Babet ser o Mihdîye Elîye û Hemserekê Meclîsê Taxa Miftî Remedan Mihemedî qisey kerdî.

**MA DO BIDÎ HEMÎNAN**

Mihemed Mihdîye Elîye sipasîya xo arde ziwan û wina va: "Na hetkarî yena manaya piştîdayîşêyewbînanî ya şarê taxa Miftî."

Hemserekê Meclîsê Taxa Miftî Remedan Mihemedî zî qisey kerd û wina va: "Ma bingeyê Komunî ard ca û cok ra zî zaf bi kêfweş î. Bingeyê cuye hemparî yo. Ma bi hetkarîyê heme endamanê Meclîsî, Mihemed û cinîyê ci Mihdîye rê keyeyêk herîna. Ma do hetkarî bidî heme kesê ke bêkeye yî."



## Butçe de 46,9 mîlyar fîre esto

24ê kanûne de butçeya 2017 bi nameyê Qanûnê Butçe yê Îdareyê Merkezî yê 2017 Rojnameyo Fermî de ameybî weşanayîş. Goreyê butçeya 2017 ke rojname de ameya weşênayîş; 645,1 mîlyar TL şîyaye û 598 mîlyar TL zî ameye yo. Goreyê butçe nika ra 46,9 mîlyar TL fîre esto.

Goreyê nuşteya lekolînorgî, Wezaretîya Malîye netîceyê butçeya aşma teşrîna peyên zî aşkere kerde. Goreyê netîceyî şîyayeyo nimite vejîyayo duşto tewr berz. Aşma teşrîna peyêne de şîyaye pêro pîya 837 mîlyon 350 hezar lîra bîyo. Îqtîdarê AKPyî ke her roje polîtîkayanê şer û şîdetî zêde keno, çimeyanê şer vera şarî de dano xebetnayîş.

Hetê nêyî de hukmat heme şîyayeyan bin nameyê şîyayeyo nimite de nîşan dano û hewl dano serê polîtîkayanê xo yê şer û şîdetî binimino. ***AMED***

## Muxabîrê WSJyî binê tecrîdî de mendo

Muxabîrê Stenbolî yê Wall Street Journalî Dîon Nîssenbaumo ke roja sêşeme amebî tepiştiş û roja îne serbest amebî veradayîş, agêra welatê xo. Nîssenbaumî derheqê wextê xo yê tepiştişî de qisey kerd û wina va: "Ez tersê gelo çi bibo, cuyaya. Merdim nêzano do ewja de çiqas bimano û teber reyde ti têkilîya mi nêmendbî."



Nîssenbaumî ser keyepelê xo yê Twîtterî ra zî dîyar kerdbî ke o qatê cêrzemînî de hucreyo yew kesî ke cayê destawa ci çinêbî û pencera ci zî amebî padayîş de mendo. Reyna Nissenbaumî wina va: "Selahîyetdaran waşt yew belgeya tirkî bi mi bidî îmzekerdiş, wexto ke mi îngîlîzîya belge waşt, fek ti ra veradayî."

Derhênerê pêroyî yê WSJyî Gerard Baker û dîrektorê Komunîkasyonî yê Şîrketê WSJyî zî babete ser o reaksîyon nîşanê tepiştişê muxabîrê xo dayî.

**DO DEMÊK NÊNUSO**

Rojnameger û nuştox Hasan Cemalî zî hêrişê Stenbolî ra dima ser keyepelê xo yê Twîtterî ra xeberêk wina va: "Ez heta demêk nêwazena binusa. Ez serra 2017î ra tersena, wa Homa şima hemînan rê rehetî bido." ***AMED***

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
3 Çile Sêşem 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
*Yenişehir-DİYARBAKIR*

*Tel:* 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
*İstanbul:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. *No:* 23/A
*Küçükçekmece İSTANBUL*
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Adana:* Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok. *No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
*e mail:*
rojevamedya@hotmail.com




# Li Dêrikê kargeha cîpsan



Li rojavayê Kurdistanê, xebatên aborî tevî derfetên kêm dewam dikin. Komîteya aboriyê ya TEV-DEM'ê li gelek kargehên ku girêdayî saziya çandiniyê ne berheman hildiberîne. Yek ji van kargehan jî, kargeha cîpsan e ku li Dêrikê dixebite. Li vê kargehê 8 kes dixebitin ku 6 jê jin in. Kargeh ev salek e dixebite. Li vê kargehê rojane bi qasî hezar kîsên cîpsan tên amadekirin û ji dikandarên li Rojava re bi buhayekî kêm tên firotin. Cîpsên garis, bi rengekî kontrolkirî û di nav şert û mercên paqij de tên hilberandin. Buhayê cîpsan jî hat sererastkirin û bi vî rengî pêşî li buhayê zêde hat girtin. Berpirsyarê kargeha cîpsan Ahmet Newaf bal kişand ser ambargoya aborî ya li ser Rojava û wiha got: "Made û berhemên ji derve tên bi buhayekî gelekî zêde tên firotin. Ev rewş ji bo cîpsan jî derbasdar e. Me xwest xwe bi xwe çêkin û bi buhayekî kêm bigihînin gelê xwe. Li Rojava derfetên me kêm bin jî dê gelek kargehên din jî bên vekirin. Em naxwazin girêdayî derveyî welat bin." Xebatkara kargehê Emîne Beşîr jî kêfxweşiya xwe anî ziman û wiha axivî: "Heke em ne li cihekî bi vî rengî, li cihekî dewletê yan jî patronekî bixebitiyana, dê zext li me bihata kirin. Lê belê em hem karê xwe dikin, hem jî gelekî rehet in. Ji ber ku tu zext li me nayên kirin." **DÊRIK - ANF**

## Heweya qirêjî tenduristiya îzmîriyan DIXE TALÛKEYÊ



Li Îzmîrê ji ber ku komira bêqalîte tê şewitandin û balaxaneyên bilind destûr nadin ba bê, hewaya girêjî li ser bajar kom dibe. Ji ber ku komir baş naşewite rêjeya karbon û kukurtê tê guhertin û gefan li tenduristiya mirov dixwe. Li gorî daneyên meha borî ya Wezareta Hawîrdor û Bajarvaniyê ya Tora Şopandina Kalîteya Hewa ya Neteweyî li gelek deverên bajêr qirêjiya hewayê zêde bûye û gefan li tenduristiya mirovan dixwe.

Li gorî stantartan hewaya ku pêwist e herî zêde di metrekûpê de ji sedî 90 madeyên biyanî hebin, li gorî pîvanên îstasyonên Alsancak, Gazîemîr, Şîrînyer, Guzelyali, Çîglî, Karşiyaka û Bayrakliyê hewaya li Guzelyaliyê ji sedî 265, li Gazîemîrê ji sedî 263, li Bayrakliyê ji sedî 261 û li Şîrînyeriyê jî rêje derketiye ji sedî 208'an. Hewa ku sê qatan qirêjî bûye, gefên mezin li tenduristiya mirovan dixwe. Li gorî daneyan li tevahiya Îzmîrê rêje ji sedî 113 derbas bûye.

Li ser mijara qirêjiya hewayê ekolojîst Ertugrul Barka axivî û anî ziman ku sedema herî mezin a qirêjiya hewayê komira xerab e û da zanîn ku balaxane jî dibin sedem ku hewa belav nebe û qirêjiyê zêde dike. Barka destnîşan kir ku korîdora hewayê ya di ser herêma Alîaga, Herêma Organîze ya Alîaga û Karşiyaka re derbasî Kemalpaşayê dibe, ji ber bi balaxaneyan hatiye girtin, hewaya qirêjî derbas nabe û got ku li gel balaxaneyên hatine avakirin niha plana 110 balaxaneyên din jî hatiye kirin û ev tişt anî ziman: "Komira xerab û balaxane dibin sedema hewaya qirêj. Divê bi lezgîn rê li pêş vê komirê bê girtin û êdî ev komir neyê şewitandin û divê dar û daristan bên zêdekirin." **ÎZMÎR - DÎHABER**

## Esnafên Îzmîrê ÎFLAS DIKIN



Li Tirkiyeyê buhabûna dolar a li hemberî lîrayê tirkan (TL) krîza aborî her ku diçe zêdetir dike. Esnafên ku kirîn û firotina xwe bi dolaran dikin, ji ber ku dolar li hemberî TL bê qîmet dibe, êdî zêde nikarin alav û amûran bistînin û neçar dimînin ku derabeyên dikanên xwe bigirin. Esnafên 1'emîn Herêma Pîşesaziyê ya Halkapinarê ya Îzmirê jî ji ber buhabûna dolar êdî nikarin malzeme bistînin û kar bikin. Esnafên Herêma Pîşesaziyê diyar kir ku ew ji ber zêdebûna dolar nikarin bixebitin û neçar dimînin ku dikanên xwe bigirin. Esnafan anî ziman ku berê rewşa wan a kar baş bûye lê niha ji ber tunebûna kar îflas dikin. **ÎZMÎR - DÎHABER**

# Penêrê Wanê êdî nayê firotin!



Pêvajoya şer û krîza aborî li Wanê bandor li ser penêrê jî kir. Penêrê bi giha yê ku par bi 20-30 TL'î dihat firotin îsal ji ber ku kêm e, vê yekê li ser buhayê wî jî bandora neyînî kir. Kîloya penêr bi 15 TL'î tê firotin lê dîsa jî zêde eleqe tune ye. Esnafên li Sûka Penêr ji diyar kir ku hin rojan nikarin siftehê jî bikin û anî ziman ku esnafên ku her sal bi tonan penêr îxrac dikirin niha li benda çareseriyekî ne.

Ji ber destpêkirina şer û krîza aborî esnafên Wanê ku penêrê bi giha difiroşin bi gazinc in.

**Esnafan anî ziman ku ew ji ber rewşa heyî nikarin penêrê ku di destê wan de ye bifiroşin**

Esnafê bi navê Ahmet Tazegul diyar kir ku penêrê bi 25 cureyên gihayan tê çêkirin û firotin li gorî salên borî rastî eleqeyeke mezin nayê û da zanîn ku ji ber şerê ku hatiye destpêkirin ew nikarin kar bikin û ev tişt anî ziman: "Ji ber şer êdî turîstên biyanî û yên xwecih nayên, ev bandorê li ser karê me dike. Wekî salên borî kar nîn e. Penêrê ku biharê hatiye çêkirin hemû di destê esnafan de ma."

Tazegul bi gotina "wekî ku dibêjin penêr wekî nan û avê tê firotin lê di van rojan de nayê firotin" rewşa xwe ya heyî anî ziman û wiha got: "Êdî ez matmayî dimînim, mirov çi dixwin û vedixwin. Li ser sifreya taştê penêr nebe nabe, lê êdî mirov nikarin bikirin. Heke wisa bidome gelek esnaf dê derabeyên xwe bigirin."

Esnafê bi navê Tuncer Bîrîcî got ku sedema nebûna kar pêvajoya şer û krîza aborî ye û wiha axivî: "Ji ber vê yekê em mexdûr in. Di dema aştiyê de gelek turîst dihatin lê ji ber şerê li welat êdî tu kes nayê, em nikarin kar bikin. Penêrê me hemû di destê me de ma."

Esnafê bi navê Mehdî Kaya jî destnîşan kir ku ew li ber îflasê ye û wiha berdewam kir: "Penêrê me di destên me de ma. Li sûkê 2 hevalên me mecbûr man dikanên xwe bigirin. Heke wisa bidome ez ê jî mecbûr bimînim ku dikana xwe bigirim." ***WAN - DÎHABER***



# Ji bo zarokên Şengalê alîkarî

Zarokên Şengalê li rexmê demsala sar jî diçin dibistanên li çiyayê Şengalê û bi ziman, çand û li gorî ola xwe perwerdeyê dibînin. Zarokên êzidî di nav rewşên pir nexweş de ji çûyîna xwe ya dibistanê kêm nekirine. Lê ji ber ku di aliyekê de ambargo û aliyekî din jî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê gelek pêwîstiyên zarokan hene.

Êzidiyên ku li derveyî welat in, ji bo ku zarokên şengalî di rewşên baş de biçin dibistanê alîkariyên xwe kêm nakin. Her wiha çend roj berê êzidiyên ku li Almanyayê dijîn alîkariyên wekî pêlav û gore ji bo zarokên ku li Çiyayê Şengalê perwerde dibînin, şandin. Ji aliyê din ve ji gundê Xanesorê heta navenda Şengalê bi giştî 9 dibistan hene û nêzîkê 600 xwendekar perwerdeyê lê dibînin. Mamosteya dibistana Şehîd Bapîr Xanim Cirdo anî ziman ku alîkariyên malbatên welatparêz wan kêfxweş dikin û diyar kir ku dê vê zivistanê lingên zarokan necemidin. ***ŞENGAL - ROJNEWS***



www.arsivakurdi.org